

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

bîrnebûn

82
2021



Burhan Sönmez bû serokê PENa navnetewî
Cîhanbeylî û êşa 52 rojan • **Muzaffer Özgür**
Bi Hakan Yaşar re hevpeyvînek • **Adem Özgür**
Şiroveya kilamên dengbêjan • **Feyzî Mîrhesen**
Bihîstina şînen me li xerîbîyê • **Altun Başaran**
Revendo, tu têyî Şpa.... **Heinrich Böll**
Berşu • **Mehtab Îdelî**
Kurd: Nevîyên Nûh • **Rohat Alakom**



Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 82 / 2021
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Editor: Ali Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê
Ali Çiftçi, Altun Başaran, Seyfi Dogan, Adem Özgür, Mem Xelikan,
Feyzi Mirhesen, Rojan Enes, Rohat Alakom,
Muzaffer Özgür, Hızır Akbina, Hayrettin Güven,
Abdulkaki Xalisinan, Seyidhan Anter, Nuh Ateş,
Mehtab Îdelî, Xizan Şilan, Ehmed Berber,

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Baski: Apec-Tryck AB

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 10 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK –Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Türkiye
İstanbul
Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebun.eu

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tînin,
sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwediyên
nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almaniyayê piştigirên kovarê ne.

bîrnebûn

82

2021

Wêneyê berga pêşin: Hakan Yaşar

Atışa

ISSN 1402-7488

bîrnebûn 82/2021

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Alî Çiftçî
Pêşerojekê ji zarokên me re çêbikin	6	
Burhan Sönmez bû serokê PENa navnetewî	8	
Xelata Wêjeyê ya Nobelê ya 2021an	10	
Xelata Aştiyê ya 2021an	11	
Cihanbeylî û êşa 52 rojan - I-	12	Muzaffer Özgür
Helbest / Baran li teqê min dixê	15	Mem Xelîkan • Rojvan Enes
Kilamên me, Elegcî	16	Mem Xelîkan
Nîgarkêş Hakan Yaşar	18	Adem Özgür
Lo Şifero	22	Abdulkakî Xalisinan
Şiroveya kilamên dengbêjan - I	24	Feyzî Mîrhesen
Du ciwanên kurd bûn endamên parlamentoya Norwecê	32	
Tenêfiya westiyayî	34	Xizan Şîlan
Bihîstina şînen me li xerîbîyê	36	Altun Başaran
Revendo, tu têyî Şpa	38	Heinrich Böll
Stockholmê	46	Seyidxan Anter
Berşu	50	Mehtab Îdelî
Kurd: Nevîyên Nûh	54	Rohat Alakom
Qerfo / Quto	67	Seyfî Doğan
Helbest	68	Seyfî Doğan
Henek	70	Ferîdun
Odeyên gundan	71	Hızır Akbîna
Dengê bavê min-II	72	Hayrettîn Güven
Dengbêj, Ayfer Duzdaş	74	
Êkane	76	Ehmed Berber
Ji çarînên Omer Xeyam	78	Wergera ji farisî: Ehmed Mîlan

Ji Bîrnebûnê

Ji destpêka 2020an vir ve li seranserê cihanê, ev nêzikê du sala ne, însan di nav xemgînî û depresyonê de derbas dibin ji ber ev sawa covîd-19ê.

Ji bo rê li belavbûna vê sawê bêt girtin li pir welatan, bi taybetî li wan welatên ku tradisyona dîktatorîyê berfireh e, yekcar ev tradisyonên xwe yên dîktatorî bi kar anîn û rewşa piranîya însanan, bi taybetî kesên xizan hîn xiraptir û dijiwartir kirin. Meh bi meh bi qedexeya derketina kolanan, dibistanên girtî, karê li malê, îzolasyona civakî û bi sed hezaran merivên ku ji ber pêşketina vîrusê karê xwe wenda kirin!...

Ev cara yekem e ku lêkolîneran di vî warî de hewl dane bizanin ka heta niha pandemîyê li çaralîyê cîhanê çiqas bandor li ser psîkolojîya merivan kiriye.

Li gorî lêkolînên ji hêla lêkolînerên li zanîngeha Queenslanda Avusturalayayê ve hafî çêkirin û di kovara *The Lancet* de hatiye weşandin, pandemîyê sala çûyî 53 mîlyon bûyerên depresyonê û 76 mîlyon bûyerên din ên xemgînîyê zêdetir bûne.

Xemgînî tîrsek an xofek xurt e ku pir caran di laşê merivan de tê hîskirin. Xemgînbûn pir normal e. Xemgînî, bi taybetî ji stress, bûyer an guhartinên mezin dema di jiyana merivan de çêdibin, li merivan peyda dibe. Xemgînî pirê caran pişfî demekê derbas dibe. Ger xof û tîrs bi hêz be û ji bo demek dirêj ber-

dewam bike û bandorê li ser hest û fonksiyona we ya di jiyana rojane de bike, xem, diltirsîfî û guman zêdetir dibe, însan dikevin depresyonê, xwestek û enerjîya danûstandina bi tiştan kêmtir an wenda dibe, û jiyana rojane giran û bêwate dibe.

Mirovatîyê wek vê sawê heta ji vêya xirabtir jî nexweşî berteref kirin: pandemîyên wek weba, kolera û vîrûsa pişfî şerê cîhanê ya ku bi navê nexwaşîya spanyayê bi nav kirin ku 500 mîlyon însan li cîhanê pêketin û bi sed hezaran însan telef bûn. Em bi hêvî ne ku li hemberî vê sawê jî, bi pêşxistina derziyên aşîyê rê li ber wê bigirê.

Mixabin li nav însanên me jî pir kes di vê dema derbasbûyî de ji ber vê sawê telef bûn. Pir însanên me yên hêja, ciwan, salmezin roj nebûn ku em xeberên mirîna wan li ser medya-sosyal newxînin!

Ew malbatên ku merivên xwe, nas û hezkirîyên xwe wenda kirin, li vir em ji wan re sersaxîyê dixwazin.

Xwendevanên birêz, li gel ev nexwaşîyên ku ji ber pandemîyê peyda bûn, jiyana rojane herçiqas wek caran nebe jî her berdewam e. Niha li piranîya welatên Ewropayê tengkirina ku li hember jiyana rojane hebû, hatine rakirin, pandemî hinekî sivik bûye, jiyana ber bi normalbûnê ve tere.

Beî pandemîyê Weqfa KANê li şaredariya Botkyrkayê li bajarê Stockholma Swêdê dest bi mekteba Şemîyê kiribû bo zarokên kurd.

Ji ber pandemîyê demekê navber hatibû dayîn. Bi destpêka vê payîzê re dîsan her rojên şemîyan vekirî ye. Bi sernivîsa *Pêşerojekê ji zarokên me re çêbikin* agahîyên di derbarê vê xebatê de hene.

Burhan Sönmez nivîskarekî li welêt û li cîhana edebîyatê tê naskirin, li gelek welatan berhemên wî hatine wergerandin. Di vê hejmarê de bi sernivîsa *Burhan Sönmez nasandineka kurt heye*. Di 24ê payîza pêşîn a 2021an de nivîskar û parêzerê mafê mirovan, Burhan Sönmez wek serokê PENa Navneteweyî hat hilbijartin. Em bi vê xeberê dilşa bûn û wî pîroz dikin.

Xelata Wêjeyê ya Nobelê ku ji alîyê foneke Alfred Nobel ve hatiye avakirin, li Swêdê hersal tê dayîn. Ev fon ji alîyê Weqfa Nobelê ve tê birêvebirin û Akademîya Swêdê jî xwedî erka tayînkirina xelatê ye. Xeberên xelata edebîyatê û ya aşîfîyê ya 2021an hûn ê di vê hejmarê bibînin.

Muzaffer Özgür bi sernivîsa *Cihanbeylî û êşa 52 rojan bîranîneka* bi êş ya jineka ji rojavayê Tirkîyê nivîsiye ku bûyer li gundekî Anatoliya Navîn rûdaye.

Mem Xelîkan di rêzenivîsa xwe ya *kilamên me* de kilama *Elegçî* bi kurteşîroveyekê ev kilama berhev kiriye.

Hakan Yaşar nîgarkêşekî li welatê Norwecê bi nav û deng e. Hekarê me Adem Özgür, Hakan û berhemên wî bi me dide naskirin.

Abdulkarî Xalîsînan bi helbesta *Lo şifero*, Feyzî Mîrhesen bi sernivî-

sa *Şîroveya kilamên dengbêjan*, Rojvan Enes bi helbeta xwe ya *Baran li teqê min dixê*, Xizan Şîlan bi helbesta *Tenêfîya westiyayî*, Altun Başaranê li ser şareyên me bi navê *Bihîstina şînen me li xerîbîyê* hem Ela Rehmê wek şare daye nasandin û hem jî kilameka wê ya şînê nivîsiye.

Nuh Ateş bi wergera ji almanî çîrokeka Heinrich Böll a bi navê *Revendo, tu têyî şpa...* nivîsiye.

Seyidxan Anter bi sernivîsa *Stockholmê*, ji salên 1980î û vir ve rêxistinên kurdan û xebatên wan nivîsiye. Mehtap Îdelîyê li ser gotina berşu ku kewneşopîyeka di nav kurdên An3atoliyayê de hebû bi navê *Berşu* nivîsiye û bi vê xebatê ev gotin û bi dehan gotinên di wî warî de berhev kirîye.

Lêkolîner Rohat Alakom bi Keşfîya Nûh xwe gîyand vê hejmarê me. Bi sernivîsa *Kurd: Nevîyên Nûh* ji pirtûkên pîroz wek tewrat, încîl û qûranê û herwiha ji berhemên lêkolîner û gerokên wek Ewliya Çelebî lêkolîneke balkêş amade kiriye.

Seyfî Doğan, bi navê *qerfo* û *quto*, kurtehelbest, Ferîdun bi *henek* û Hizir Akbina bi sernivîsa *Odeyên gundan*, Ehmed Berber bi helbesta *Êkane* û Hayrettîn Güven bi rêzenivîsa xwe ya *Dengê bavê min*, Ehmed Milan ji *çarînen Omer Xeyam* bi wergera ji farisî: ev hejmarê dewlementir kirine.

Bi hêviya ku em gîştik xwe û kesên li derûdora xwe ji vê pandemîyê, herçi qas niha hinekî sivikbûye jî, biparêzin, bimînin di xêr û xwaşîyê de heta hejmara bê!...

Alî Çiftçi

Pêşerojekê ji zarokên me re çêbikin

Wezîfeya me ew e ku em hezkirinek bo fêrbûnê biafirînin.

Bo wê Waqîfa Kurdên Anatolîya Navîn (KAN) piştî sistbûna pandemiyê, li Stockholmê li taxa şaredariya Botkyrkayê, li taxa Fittjayê dîsan dest bi Mekteba Şemiyê kir.

Mekteba Şemiyê ji bo zarokên navbera 3-15 salî her roja şemiyê li saet 12-14an e. Şûna mektebê li Södra Stockholms Folkhögskolan e.

Ji Slagsta, Norsborg, Stockholm zarok tî Mekteba Şemiyê.

Ew malbatên ku bixwazin zarokên xwe bînin, dikarin serlêdana xwe li ser malpera waqîfê bikin. www.stiftelsenkan.com/mekteba-semiye



Waqîfa Kurdên Anatolîya Navîn (KAN) di 24ê adara 2002an de ji hêla nêzikê 30 kurdên ji Anatolîya Navîn in, bi fermî hat damezrandin. Waqîf li rêvebirîya wîyaleta Stockholmê qeyîtkirî ye.

Armancên giştî

Armanca Waqîfa Kurdên Anatolîya Navîn (KAN) ew e: pêşvebirina çand, ziman û xurtkirina nasnamaya kurdên Anatolîya Navîn e. Waqîf ji bo entegrasyonê dixebite.

Armanca waqîfê pêşî kurdên li Swêdê ne. Lêbelê, bi taybetî zarok û jinên kurd grûbên pêşîn ên vê armancê ne. Zarokên ji 18 salî biçûktir û jinên kurd grupên sereke ne.

Mekteba şemiyê dibistaneka ziman e ji bo zarokên ku dixwazin zimanê kurdî wekî zimanê malê fêr bibin.

Dersên ziman hem bi kurmancî û hem jî bi soranî tî dayîn. Li gor salên zarokan, komên qursan hene.

Çima zimanê dê?

Li gorî lêkolînên li ser zimanê dê hatine kirin û Daîreya Neteweyî ya Perwerdeyê ya Swêdê (Skolverket), zarokên duzimanî paşîngê di jiyane de serkeftitir dibin.

Kar û perwerde ji bo jinan

Di nav jinên kurdên Anatolîyê yê li Swêdê de hejmareka kêmtir li bazara kar a Swêdê de hene. Faktora bingehîn an asta xwendinê ya kêmtir an jî nebûna perwerdeyê ye.

Waqîfa KAN bawer dike ku ev kombînasyonê xeter e ku divê were çareserkirin û tevdiîrên pêşlêgirtinê bêne kirin. Waqîfa KAN di hundirê tora dêûbavan û tora ciwanan de bixebite da ku ji însanên me re şert û mercên çêtir peyda bibin ku di derbarê lêgerîna kar an xwendina bi bandor de li ser awayê çêtîrîn bi axivîn û gotûbêj bikin.

Tora dêûbavan

Tora dêûbavan platformek e ji bo kesên nûhatî bibe alîkar ku dêûbav li Swêdê bikaribin xwedî destpêkeke baş bin. Bi semîner û civînên agahdarîyê, dêûbav li ser mezinkirina zarokan, cûdakariyê, ol, perwerde û xebatê deng bikin. Di heman demê de serdanên lêkolînê yê sazîyên civakî yê girîng ên ku di nav komên dêûbavan de li seranserê welêt tîne kirin agahdarî dê bînin berhev kirin.



Tora Ciwanan

Tora ciwanan dê ciwanan teşwîq bike û wan bi kurdên Swêdê yên entegrekiî û ciwanên swêdî yên pir nifş ve girêbide da ku destpêkek baş bistînin. Semînerên jîbo bilindkirina mofivasyonê bi mijarên cihê-reng ji xwendekarên zanîngeha Swêdê bîr organîzekirin. Çalakîyên cihê-rengên çandî di nav şaredariyê de ji bo afirandina platformek ku ciwanên bi komên etnîkî yên cihê-reng lê dicivin û civakê diafirînin teşwîq bike.

Îmtîhana unîversîteyê

Qursek 25 heftan bo amadebûna îmtîhana ji bo kesên ku pola dawî ya lîsê dixwînin yan jî xilaskirina lîseyê. Kesên ku pola dawî ya lîseyê dixwînin dikarin rojên îne û şemiyê qursê bigrin. Kesên ku lîse xilas kirine dikarin yan di hûndirê heftê da yan jî dawîya heftê de qursê bigrin.

Afirîner & karsazî

Kurd miletekî afirîner/avakar e. Bi destpêkirina jiyana xwe ya li Swêdê, koma kurdên li Swêdê van salên dawîn ji bo debara xwe di nav civata swêdî de bi awakirina mîna xwaringeh/resta-urang, lînêrîna tenduristî û civakî, hemşîre û perwerdeyîyê de dixebitin. Ji mêj ve tê zanîn ku kurdên Swêdê, bi taybetî yên ji Anatoliya Navîn, xwedî şîrketên biçûk yên wek xwaringeh, pîzzerîya, firoşgeh û karûbarê taksîcîyê dikin.

Waqîfa KAN dixwaze modelek pêşve bixe ku bêtir mirovan teşwîq bike ku bi destpêkirina û birêvebirina formên pargîdanîya cihê-reng li jiyana xwe biafirînin. Waqîfa KAN dixwaze 'netverka' grubên karsazîyê pêşve bixe da ku bêtir karsazî di nav kurdên Swêdê de pêş keve.



Burhan Sonmez

PEN Club International komeleyeke nivîskarên navneteweyî ye ku di 5ê payîza navîn a 1921an de li Londonê ji hêla nivîskarên Brîtanî Catherine Amy Dawson Scott û John Galsworthy hatiye damezrandin.

PEN ji herfên destpêkê yên peyvên îngilîzî poets (helbestvan), playwrights (lîstikvan), essayists û novelists (romannivîs) pêk tê. Û ji damezrandina xwe vir ve, tenê kurteya PEN li şûna van hemû peyvyan hatiye bikar anîn. Pen bi îngilîzî jî tê wateya "pênûs".

Piştî Şerê Cihanê yê Yekem, ew yekem car wekî komek heval li klûbeke li Îngilîstanê derket ku tê de gelek nivîskar dihatin ba hev û bi inisiyatîfên xwe pir caran wek grubeka hevalan li hev dicivîn, lê paşê struktureke rêxistinî danê.

Ev rêxistina, ku navenda wê ya navneteweyî li Londonê ye, hewl dide ku ji hemî kesayetîyên siyasî dûr bimîne û ji bo misogerkirina azadîya raman, ravekirin û çapameniyê, û parastina mafên nivîskaran li çaralîyê cîhanê biparêze.

Hejmara welatên ku di sala 1926an de bûne endamên PENê 25 bûn. Federasyona Klûbên Navneteweyî yên PENê, ku 102 welat endamên wê ne û 144 navendên wê hene, di heman demê de şêwirmendê mafên mirovan yê UNESCOyê dike.

pen
INTERNATIONAL



Burhan Sönmez ji bo serokê PENa Navneteweyî hat hilbijartin ji ber ku Jennifer Clement dema xwe ya şeşsalî temam kir. Nivîskara meksîkî-amerîkî Jennifer Clement, yekem jin bû ku bûbû seroka PENê.

Di 24ê payîza pêşîn 2021an de nivîskar û parêzerê mafê mirovan yê kurd Burhan Sönmez wek serokê PENa Navneteweyî hat hilbijartin. Sönmez xwedîyê gelek xelatên edebîyatê ye.

Mecîsa nûneran a PENa Navneteweyî Burhan Sönmez wekî serokê nû yê rêxistinê di merasîma sedsalîya Kongreya PENê de hilbijart.

Di hilbijartina xwe de, Sönmez wiha got: *"Ez spasîya hevalên xwe yên endamên PENê dikim ku pêşeroja PENê spartine min - rûmet û berpirsiyarîyek e ku ez nas dikim û dê di hiş û dilê xwe de bidomînim dema ku ez rola serokê rêxistina me ya hêja dagirim. Wekî Serokê nû yê PENa Navneteweyî ez xwe serbilind hîs dikim ku di rêza mirovên mezin ên wêje û azadîyê de mîna Catherine Amy Dawson Scott, Jennifer Clement, Per Wastberg, John Ralston Saul, H.G. Wells, Arthur Miller û Heinrich Böll."* Burhan Sönmez, Serokê PENa Navneteweyî

Burhan Sönmez ku li gundê Büyük Konak Görmez (Şêxan) yê Heymanayê hatiye dunyayê, di salên piştî darbeya leşkerî ya 1980an de hukuqê dixwîne. Ew li Stenbolê li navendeka êşkenceyê ya navdar de hatiye girtin, ji ber ku di dema cuntayê de yekem çalakîya xwendekaran organîze kirîye. Wek parêzerekî ku li ser dozên mafên mirovan dixebite, ew

bû hedefa tacîzên polîs û navenda dozên dadgehê.


Di vê demê de, Sönmez dest bi nivîsandina romanên dike, ji çîrokên kevneşopî yên ku wî dema li gundekî kurdên Anatolîya Navîn, li Heymaneyê mezin bûbû, îlham wergirtibû. Berhemên wî yên navdar Bakur (Kuzey, 2009), Bêguneh (Masumlar, 2011), Stenbol (İstanbul 2015), Labîrent (Labirent, 2018), û Kevir û sî (Taş ve Gölge, 2021), bi çilûdu zimanan hatine wergerandin.

Sönmez wergirê xelata wêjeyê ya EBRD (2018), xelata aşîyê ya Xemgîn (2017), Xelata Rûmetê ya çîroka herî baş a Buyaz (2015), Xelata Wêjeyê Sedat Simavi (2011), û xelata romana herî serkefî ya St. (2011) wergirtiye.

Ew mamosteyê wêje û romanê li zanîngeha METU bû, endamê panelê diwanê ji bo xelata wêjeyê ya Cevdet Kudret 2014 û ji bo festîvala fîlman a navneteweyî ya Cenevreyê 2020an berpirsiyarî wergirtiye

Damezrênerê TAKSAV, Weqfa Lêkolîn, Çand û Hunerê ya Cîvakî, Sönmez endamê PENa Îngîlîz, PENa Kurd û PENa Tirkîyeyê ye û endamê berê yê desteya rêvebirên PENa Navneteweyî ye.






Xelata Wêjeyê ya Nobelê ji aliyê foneke ku Alfred Nobelê ve hatiye avakirin, tê dayîn. Ev fon ji aliyê Weqfa Nobelê ve tê birêvebirin û Akademiya Swêdê ji xwedî erka tayînkirina xelatê ye.

Xelata Wêjeyê ya Nobelê ya 2021an

ji romannivîs **Abdulrazak Gurnah** re hat dayîn.



Rexnegir û profesorê edebî Abdulrazak Gurnah di sala 1948an de li Zanzîbarê, Tanzanyayê ya Afrikayê ji dayik bûye û li Îngilîstanê dixebite û li wir di salên 1960î de weke penaber hatiye û bi Îngilîzî dinivîsîne. Di sala 1987an de bi romana *Hafizeya Dûrketinê* re hat nasîn. Ev serkeftin di sala 1994an da bi romana *Paradisê (Bihuşt)* ya ku ji bo Xelata Booker û Xelata Whitbread a Fîksîyonê hatibû namzedkirin. 10 romanên wî heta niha hatine weşandin. Du ji wan, *Bihuşt* û *Diyariya Dawî* bi swêdî hatine wergerandin û di sala 2015'an de li Swêdê hatin weşandin, weşand.

Romana bi navê *Bihuşt* di destpêka sedsala 19an de li Afrîkaya Rojhilat a misilmanan, li ser Yûsûfê 12 salî yê, xizan e ku weke kole tê firotin, hatiye nivîsîn.

Xelatgirê Nobelê Abdulrazak Gurnah ji bilî nivîskarîya xwe rexnegirê û profesorê edebîyatê ye.

Abdulrazak Gurnah derbarê antolojîyên wêjeya Afrîkayê jî kar kiriye û li ser nivîskarên din ên postkolonyalên hemdem lêkolîye û nivîsandiye.

Abdulrazak Gurnah weke yek ji nivîskarên sereke yê postkolonyal ên ji Afrîkayê tê qebûlkirin.

Bi motivekirina:

"Helwesta bêtawîz a derbarê bandora kolonyalîzmê ya li ser qedera penaberan û bi dîlgermîyeka mezin ronîkirina çûdahîya çandên di navbera parzemînan de."

Sekreterê daîmî yê Akademîya Swêdî

Xelata Aştîyê ya 2021 an balê dikişîne ser azadîya ramanê



Xelata Aştîyê ya Nobelê ji bo du rojnamevan Marîa Ressa û Dmîtrî Mûratov hat dayîn. Her duyan jî jiyana xwe ji bo parastina **azadîya xwe îfadekirinê** ya demokratîk veqetandine, ku ev jî ji bo aştîya berdewamî şert e. Komîteya Nobelê ya Norwecê ew ji ber vê hêjayî xelatê dîtine.

Marîa Ressa ya Fîlîpînî, 58 salî, yek ji parêzvanên herî navdar ên cîhanê ye ji bo *axaftina azad* û di sala 2012an de malpera nûçeyan *rappler* damezrand. Bivê platformê, wê xwe wek yek ji rexnegirên tûj

ên serokkomar Rodrîgo Andricû yê cihê nîqaşê dîdît. Ji bo têkoşîna azadîya çapemenîyê ya li Fîlîpînan gelekî girîng bû. Ji bo vê par xelata Tucholsky a Pena Swêdê wergirtibû.

Dmîtrî Mûratov yê 60 salî, edîtorê rojnameya serbixwe ya Rûsyayê *Novaya Gazeta* ya ku gelek caran bûye hedefa gef, êrîş û kuştinan. Anna Polîtkovskaya rojnamevaneka bi cesaret bû ku profileka herî bilind a vê rojnameyê bû.

Dmîtrî Mûratov ev xelata veng bi nav kir: "**Ev xelat ji bo wan hemû hevkar û hevalên me ne ku hatine qetilkirin.**"



Marîa Ressa



Dmîtrî Mûratov

Bîranînên bi êş yên jineka ji rojavaya
Tirkîyê

Cîhanbeylî û êşa 52 rojan -1-

Muzaffer Özgür

Bajaroka me nêzî
behrê ye. Dar, da-
ristan, bax û baxçe
lê pîr in. Darên
zeytûnan, tûyan,
hêcîran, sêvan,
zerdelan, porteçal
û yên din, dor bajêr
dixemlînin. Di nav bax
û baxçan de tiñ ge-
lek e û malbat ji bo xwe

heşinahîyê diçinin. Bajaroka min
xweşik e. Bîhna behrê dema bi
bayê şevê re diket pozê însên, me-
riv gelek kêfxweş dibû. Havîn germ
e, zivistan jî pîr ne giran e. Deşt û zo-
zan, fireh in li ba me. Avên çemên
mezin yê ku ji nav Anatolîyê der tî-
n û heta behra me diheriqin jî hene.
Av jîyan e li ba me.

Ji bo wê bi mîlyonan kesan ji
bajarên Anatolîyê koçî herema me
kirine. Jîyan li herema me xweş e.
Însanên alîyê me jî wek qereker
ne xirab in. Gundî dilpaqij, bajarî

bi tolerans in. Bi rastî
li ba me di nav ol,
netew û însanan de
cûdahî tune. Min biçûkdîtina ol,
netew û însanan
nedîye, nizamim.

Min heta lîsê dibis-
tan li bajaroka xwe
xwend. Dûre ji bo xwen-
dina bilind ji malbata xwe

bi dûr ketim. Li bajarê Îzmîrê çar sa-
lan mam. Ez keçikeka ciwan, ji xwe
xweş, pordirêj, bedenzirav, xweşik û
çavşîn bûm. Malbata min jî min pîr
hez dikir - ez delala malbatê bûm.

Xwûşka min jî heye. Ji ber ku ez
mezin im û terî xwandinê hezkira
wan im. Li bajarê me, mehela me,
çavên xortan li min bûn lê, min qet
li tu kesan meze nedikir. Xazgînîyê
min yek dihat yê din diçû. Mamos-
te, polîs, muhendîs, doxtir û nizamim
kî, gelek ketibûn dorê. Ez li ber fikir
û ramanên xwe bûm. Zewac hîn

zû bû û min pêşniyarên malbata xwe qebûl nekirin. Elbet zewac jî çêbûya, wek jinekê mal û zarokên min jî gerek hebûna lê, ne niha. Elbet xeyal û daxwazên min jî hebûn. Min xeyalên xwe di paşila xwe de veşartibûn. Niha dema xizmeta gel bû.

Min dibistana hemşîrefiyê xelas kiribû û li benda tayîna xwe bûm. Di wan rojan de jî Wezereta Tandirûstiyê ji min re nameyek hat. Dema name ket destên min, ji bo ku ez wê vekim û bixwînim kelecaneke mezin bi min girt, destên min cirifin. Dayika min av da min û min çend qult vexwarin. Min giran giran name vekir û xwend.

Li bajarê Konyayê, qeza Cîhanbeyliyê bûbû para min. Tayîna min derketibû nexwaşxana Cîhanbeyliyê. Min nizanîbû şa bibim an xemgîn. Lê destpêkirina kar serfiraziyeka mezin bû ji bo min. Dema min navê Konyayê di nameyê de xwend, Mevlana hat bîra min - wî gotibû: "Were, kî dibî bila bibî dîsa jî were." "Eza herim û te jî zîyaret bikim" xwe bi xwe min got. Lê cîhê ku ez dê lê kar bikim Cîhanbeylî bû. Kuder bû? Çawa bû? Însanên wir çawa bûn? Mereqên min zêde bûn. Ez rabûm çûm pirtûkxana bajêr. Ji ansiklopêdiyan, xerîtan û pirtûkan min gelek agahdarî xwendin ji bo Cîhanbeyliyê. Lê heya meriv bi çavên xwe nebîne û neji, nizane rastiyên wir.

Evarê bavê min ji kar hat mal. Li ser şîvê, dayika min mizgînî da wî. Malbata min gelek şên û şa bû. Rojên destpêkirina kar nêzik bûn. Dayika min boxçe, katix amade

dikir ku ez bixwe re bibim. Li ba me bax û baxçe pir bûn. Şîranî, terxane, nok, zêtûn, mûj, hêcîr, hêşinahîya hişkkirî dayîka min amade kiribûn. Edin ji bo rêwîtiyê em amade bûn û bavê min biletên trêna em pê herin Konyayê kirin. Cîran, merlix, dost û heval dihatin mala me ku min pîroz bikin. Li xeribîyê jîyîn û tenêbûn ji bo min ne giran bû. Dema dibistanê jî çar salan ez ji malbat û hezkiriyên xwe bi dûr ketibûm. Disa jî di dilê min de tirsek hebû. Ez ne xwande-kar bûm ku di bin kontrola dewletê de bi alîkarîya dewletê bijiyama. Niha memûreka welêt bûm û berpirsiyariyeka min hebû.

Ew roj hat, bi trênê em derketin rêya Konyayê. Bi rê de çend bajarên mezin re derbas bû trêna me. Ji alîyekî rêwî peya dibûn ji yê din jî yên nû sîyar dibûn. Çûfaçûfa trêna me dengê xwe qet kêm nekir. Dûmanî rêş berve jor berdida, tevî ewran dibû. Li dawîya rêwîtiyeka gelek dirêj em gihîştin Konyayê.

Bavê min banî teksîyekê kir û got: "Me bibe nêzî merkeza bajêr, em ê li otêlekê bimînin." Em sîyarê teksîyê bûn. Konya, bajarekî ku li deştê hatibû avakirin û mezin bû. Bavê min ji şofêr re qala Mevlana dikir. Merkeza îdarî ya bajêr li ku bû, pirs dikir. Lê ez di nav xeyalan de bûm. Tirs, meraq û kelecane di hundirê min de ez heps kiribûm. Min di nav dengê weseyîta de li bajêr û însana mêze dikir. Textî di rêyeka fereh û paqij, nav bajêr de diçû. Ro jî diçû ava.

Em nêzî Mevlanayê li ber otelekê peya bûn. Me odeyek girt. Bavê min heqê wan dayê û em derbasî oda

xwe bûn. Otêl paqij bû. Me tiştên xwe da oda xwe û ji bo xwarinê em derketin der.

Giran giran lambên caddê bajêr vêdikekin. Em çûn lokantayekê. Bavê min ji karker pirsî: "Xorto! Xwarina Konyayê ya hafî naskirî çi ye?" Xort: "Etli ekmegê me gelek meşhûr in." Me ew xwarina xwast, bi alava dara hatibû çekirin. Pir xweş bû. Cara yekem bû me ew xwarin xwaribû. Piştî xwarinê em vegeftin otêla xwe. Em westîyabûn û ketin cîhên xwe. Bavê min raket, lê min nedikanî ez rakevim. Kelecanê rihetî nedida min. Çavên min edin venedibûn - weng raketim. Bi azana xocê sibê re bavê min rabû, lê min qet nedixwest rabim. Ji bo bîhna xwe bigire, ji oda me derket û li ser min derî bi nextarê girt çû jêr.

Demekê bi şun ve ez jî rabûm. Ketim bin ava germ, porê xwe xweş xweş şuşt. Kincên xwe li xwe kirin. Xwe xemiland. Bavê min vegefta oda me û ji bo cîhê ez serîledana xwe bikim, agahdarî dan min.

Em ji otela xwe derketin û me li cîhekî çorbe xwar. Dûre em bi peya çûn bûroya tenduristîya bajêr. Min serîledana xwe kir, ango bêjim "Ez ji bo kar hatime û ez amade me". Ka-xiz, name û xerçlixa xwe girt. Gereg bû ku ez di sê rojan de herim bajaroka Cîhanbeyîyê û serîledana xwe li ba kaymaqamê wir bikim. Karê me yê resmî xelas bûbû û dema me jî hebû.

Em nêzî mûzexanaya Mevlana bûn. Em çûn me Hz. Mevlana û dervîşên wî, mala wî zîyaret kir. Li ber derî min jî tûrikê xwe şarpa xwe derxist da serê xwe. Ez keseka serqot

bûm lê li gor bawerî û kultûra me mecbûr bûm. Me destên xwe vekirin û dua kirin. Min di hundirê xwe de got: "Xwedayê mezin, ji bo ku ez li wan derên dûr bi ser kevim, alîkarî min be. Xwedêyo! Sihet û silametiye bide min. Sebîr ma para min be. Li xweribîyê min biparêze ku ez xizmetî gelê xwe bikim." Bavê min jî li kêleka min piltépilt bû, dua dikir. Bi kêfxwaşî em ji Mevlanê derketin.

Me berî xwe da nav bajêr. Dema em berjor çûn girekî pir mezin derket pêş me. Li dawîyê me fahm kir ku navê vir "Alaeddin Tepesi" bûye. Me kevneşopîyên ji Selçûkiyan dîtin. Li jor, li baxçê çayê rûniştin. Ew roj bi kêf û şahî derbas bû. Êvar bû, ro çû ava û em hatin otêla xwe û raketin.

Berdewam dike...



Baran li teqê min dixe

Baran li teqê min dixe
Dengê xwe,
Di dil da bi olan e.
Ger pê qayîl bibî Jiyan evqas e.
Tenêfî,
Ji umrê dinyê mezintir,
Ji gunehê me biçûktir e.
Min bîr kiriye tama sêvê
Hêvîya min,
Li ser lêvê te lûsî ye
Ev hestên li vê kêlîyê
Bêdawîya vê zemanê
Wê ti careke din veng nebe,
Deng û fîlîskîya vê bayê.
Ji ber van hestan
Gotin diçilmisin
Di gewrîya min de,
Li gîyotînê dikevin.
Xwîna wan dibe girî
Ruhê min...
Girfî ye."

Rojvan Enes

Helbest

Kelekela hestên dil be
Bejn zirav û çeleng
Çav bi kil be

Dixwaze helbest
Bisk dirêj û kezîzer
Perçem şil be

Stran a sêwîyan
Hêvî ya bindestan

Qîrin a gel be
Helbest hest fîr û bedew
Dengê bêkesan
Bang û hawarek ji dil be.

Mem Xelîkan

Elegçî

Mem Xelîkan



Dilî nezan e. Xwîna xwe keli ser yekî/ê bi gura kesî nake, ti sînora jî nas nake. Carekê, bi evîndarî hez kir astengîya nizane û nas nake. Çavên wî ve, ji hezkirî û evîndarê bêfir tiştê xuya nake. Ne malê dunyayê, ne heyî ne jî tuneî. Ne axatî, ne şivanî. Dildarî, dilgirtin çiqas pîroz be, ewqas jî bi zor û bi qar e. Bi evîndaran, sewdayên reş, sewdayên veşartî, sewdayên nebextewar dide jiyandin. Evîndar, bo dildayîya/ê xwe her tiştêkî didin ber çavan. Ji bo dildara/ê xwe, ji dest fesad û xêrnexwazan di binê zindanan de, fî û birçî çûyîne mirinê. Di nabera evîndaran de, ew fedekarîya nebe, ji xwe navê wê nabe evîn.

Li nav kurdên Anatolîyê jî, evînen bi êş û bi şewat hatine jiyîn. Evîna keçika etmanî û lawikê elegçî yek ji wana ye. Li bajarokê Balayê ya ku girêdayîyê Ankarayê ye, çend gundên etmanî hene. Qasî sed safî berê, rojekê elegçî tînen konên xwe li dawîya gundekî ji wanan dadînin. Wek her tim dikin, eleg û bêjîngan çêdikin. Her roj wan li nav gund, mal

bi mal digerrînin û pê debara xwe dikine. Rojekê, keçika axayê gund lawikê elegçî dibîne ku qasnaxên eleg û bêjîngên xwe bi darê pîkosê ve kirî û li ser milê xwe digerrîne. Mîna ku çûçîkek di sîngê wê de per û baskên xwe diçerpîne û sîngê wê biqelêşe, dilê wê lêdide. Lawikê çavreş, bejn-zirav û dirêj jî, xwîna xwe dikele ser wê keçika çeleng, porzer û gulîyên xwe li navê. Ew keç û xort dil didin hev. Çend mehan evînek germ lê dawîya xwe bi êş û jan dijin. Mixabin, ji ber erf û edetan, ew evîna serê xwe nabîne.

Dema dayika keçikê bi wê rewşê dihêse, dunya wê bi serê wê de di-xele. Bi wê ecêb tê. Kê cara bihîstîye dilê keça axa bikeve lawikê elegçî! Dayika wê dîn dibûye. Pir neçûye dilê wan herdu xortana li nav gund jî belav bûye. Dayika keçikê çiqas dike nake keçika xwe ji wê sewdayê venagerîne. Keçik guh nade şîretên wê. Dayik nizane çi bike. Çend jinên cîran berhev dike, tev diherin konên elegçîyan. Jinên wanan di konekî de berhev dikin. Hal hekatê ji wan re kat dikin. Dibên: Hê mêran nebîhîstîye

sibê konên xwe ji vir rakin, çel gundî ji me dūrkevin. We nekir, ji bûyerin we-rin meydane em neberpîrsîyar in.

Soza çûyîne ji wanan digirin û vedigerin.

Keçika etmanî, sibê radibe mîna hero derdikeve der kona binêre û rêya dilgîrîyê xwe çav ke. Mixabin,

şûna kona tişteke nemayî bûye. Avek sar bi ser junîyên wê de tê. Dunya li serê wê teng dibe. Dizane çi hatiye serê wê. Ji wê evîna nebestewar û miradê neçûyê serî, kilama Keçika Etmanî û şîretên dayika wê, yên li jêre ji me re mane.

Elegçî

Bar ke bar ke Elegçîyo bar ke
Kurtin dayne ker timar ke
Etê kwîr bû zû ke serê min bişo
Gulîyê min bi çar mar ke
Min bi lawkê elegçî re bi heval ke

Êmê, mala bavê te xanedan e
Qonaxa bavê te bi heft dîregan e
Xudanê heft şivana kerîyê pezan e
Tu xemilî yî bi zêr û zîvan e
Li te nakeve lawikê elegçîyan e

Here Êmê poz bi xezemê
Tu pêçikî bi lawkê elegçî nesîb kême

Etê malê dinê li dinê bimîne
Ma bişewite qonaxa bi heft dîregan e
Ma qiran bikeve kerîyê bi heft şivane
Çavê min tine li axa û begane
Dîsa derdê dilê min lawkê elegçîyan e

Êmê tu ya konê xwe bigerînî çêlpênc gundane
Tu ya porê xwe daynî bin dara sogitane
Tu ya di pîyê xwe re kî qasnax û bêjîngane
Êmê tu ya çerx bî li nav malane
Li te nakeve lawkê elegçîyane

Here Êmê poz bi hezemê
Tu pê çi bikî lawkê elegçî nesîb kême

Erê dayikê dil nezanê
Eza pî xwe re kim qasnax û bêjîngane
Eza konê xwe bigerînim çêlpênc gundane
Eza porê xwe daynim bin dara sogitane
Dîsa derdê dilê min lawkê elegçîyane





Nîgarkêş Hakan Yaşar:

Adem Özgür
ozguradem25@gmail.com

" Ez bêyî kurdûna
xwe nikanîm di hunerê
de serkeftî bim"

Nîgarkêşê ji gundê Kelhasanê (Konya, Cihanbeyli) Hakan Yaşar, wexta ku hîn di dibistana seretayî de xwendiyê, wî dest bi xêzkinê kiriye.

Ew jî wek piraniya kurdên Anatoliya Navîn derbasê welatên Ewrûpayê bûye û li wir bi şûn bûye. Ew û malbata xwe di sala 1990î de çûne Norwecê û Hakan Yaşar demeke dirêj di karên restoranê de şuxuliye.

Bi gotina wî sedema çûyîna wî aborî û siyasî bûye.


Hakan Yaşar, mîna nîfşên wê demê, xwendina xwe li cî hîştîye û di karên restoranan de cîh girtiye.

Ew dibêje: "Min bi qawşoştinê dest bi kar kir, paşê bûme aşpêj û ez di otel û xwaringehan de şuxulîm."

Dema ku wî karên restoranê kiriye, ji nîgarkêşiyê bi dûr ketiye. Loma dev ji pir tiştan berdaye û vegehiyaye ser "xeyalên" xwe:

"Ez wê demê ji jiyana xwe eciz bûbûm. Min pir dixwest xeyalên xwe bînim şûnê. Xeyalên min resim bûn. Hîngî du restoranan min û gelek karkerên min hebûn. Min dev ji wan berdan û bi pey xeyalên xwe ketim."

Ew dibêje: "Dibe ku li dunyayê ji min bêtir kesekî din nikaribe wê bike. Min herdu cîhê karên xwe firotin û li navenda bajêr min atolyeyeke hunerê ava kir. Ji min re gelek baş bû ku ez ji xulamîyê xelas bûm."





Û Hakan Yaşar dibêje ku di karên wî yên resiman de jiyana koçberî û êşên kurdan hene.

Nîgarkêşê kurd armancên xwe giran giran bi cîh anîye û dest bi karê profesyonelî kiriye:

“Ez pir caran tecrûbeyên li ser rûyên mirovan meraq dikim. Loma min karê figuratîf tercîh kir. Fîgurên min ekserî li ser hest û dramayê ne. Ya rasfî di her karê min de ez he-me. Peyama wan, jiyana min e jî. Ez di karên xwe de bala

xwe didim anatomî, beden û tevgerê. Ji tarza min re dibêjin neoklasîk.”

Li gor wî xêz îlhama herî mezin e û rêberek e. Dibêje ku di navbera norwecîyan û kurdan de cûdahiyên mezin hene: “Di karên kurdan de êş, xwîn, bîranînên welêt têne dîtin.

Li erdnîgarîya ku ez jê tîm her roj êş heye. Di gelek pêşangehên min de, min dît ku dema mîr û jin li karê min mîze dîkin, ew digirîn. Demek ez hestên xwe baş nîşan didim.”

Ji aliyê din ve wextê ku Hakan Yaşar kar dike guh dide ser dengbêjan.

Qenaleke tirk di derbarê wî de nûçeyek çêkiribû û gotibû ku ew nîgarkêşekî tirk e. Lê Hakan Yaşar li ser hesabê xwe yê twîttêrê çewfîya wan sererast kir û got ez kurd im.



Ew dibêje ku: "Min di jiyana xwe de herdem xwe kurd da nasîn. Ez li dijî vê yekê me ku kesên kurd ji xwe re bêjin 'Ez tirk im'. Ne kêm ne jî zêde ez kurd im û zimanê min ê dayikê jî kurdî ye. Divê em bi siyaseta xwe, bi hunerê xwe, bi zanistîya xwe, bi felsefeya xwe baş bin. Ji alîyê din huner azadîyê dixwaze û ji ber vê yekê nasnameya min a kurdî ji bo min girîng e.

Ger ez nikaribim bibim xwe, ya jî kurdek, ez nikarim di hunerê de serkeftî bim."



Hakan Yaşar î jî gundê Kelhasanê balkişand ser asîmîlasyona li gundên kurdên Anatolîya Navîn jî:

Bi taybetî kurdên Anatolîya Navîn li ser rêya asîmîlasyonê ne. Divê li ser vê kar werin kirin. Ger em zimanê xwe yê dayikê winda bikin, em ê hemû nixên xwe winda bikin. Zimanê dayikê kevîrê bîngêhîn e ku gel dom dike. Di vî warî de pir karên me kurdan hene."



Lo Şifero

Yunakliyo, lo şifero
Ser kamyonê here wero
Çend sal in li benda te me
Ber malê me carek wero

Kamyonê MAN pir bi hiz tere
Şiferî baş, tim li ser e
Xwedanî mal li çav der e
Dereng memê pîr zû were

Kamyonate keskasore
Qerajê de kapi pore
Gurbet gurbet sefer tere
Zawacê me re bixêr kar e

Yaylê me jî pir pir dûr e
Kenarê xwe bilind sur e
Evîna min hat jî dor e
Rasthatinî çiqas zor e
Ser malan da dinêrî jina
Ez bi te va li vir dîne
Bira qîsa pîr nebêjin
Xazgincîya xwe bişîne



We pir xwest, min te din
Gotin şifêr e, ez nedam.
Me xêr nedî li vê dunyê
Xwedê xêrê li vir me de

Li gurbetê dilêm keşî
Sebir, sebir kevir keşî
Sal derbaz bûn, bîr nebûya
Subûn nebe, me xwest aşî

Li dunyê kotî hev hez kir
Li tomê arzûyê terk kir
Ya vuslat ya jî wenda kir
Ev evîna pir bi grî kir

Tirsî aynilixî digrî
Li dûr ket, dîsa digrî
Aşîq tim jî bi hêstir in
Sewî vuslatê tim digrî

Abdulkî Xalisinan



Şiroveya kilamên dengbêjan -1

Feyzî Mîrhesen

Denbêj an jî sitranbêj, dengbêj kesên ku sitranan diafirînin li ser êvînî, şer û pevçûnan destanên gel dibêjin. Wek romannivîs, çîrokbêj û helbestvana ne. Sitranbêj dibe ku dengxweş û kilamên heyî dibêjin. Ji ber ku di warê nivîskî de dîrok û serpêhatîyên me kurdan kêmbûn, êş û elemên civakê bi dengbêjan heya îroyî hatine. Evînî, şer, destan, şîn û şahîyên gel. Carnan di nava gel de dibû sedemên nerazîbûnan jî, çima? Filan dengbêjî li ser eşîreta filan malbatî bi alîkarî û meylkirin kilam gotine. Ev yek dibe ku rastîyên wê hebin jî lê? Ku negotana, gelo nivşa îroyî çewan wê bizanîbana. Bav û kalên me çewan şer û pevçûn di nava wan de çêbûn û bi dehan kuşî û birîndarî rûdan. Bi dehan gund û bajarên kurdan bi şer û pevçûnan wêran û kaviil bûn. Ji Rojhilat, Başur, Rojava û heya Bakur serê eşîretan bûne firar û qaçax.

Ne bi tenê kilamên şeran her wisan kilamên evînîyê jî, çewan em dibînin ku di kilaman de tîn gotin ku keçikan gazin kirine ku dibêjin "Bila dê û bavê min xêrê nebînin/çewan min nedane dilkefiyê min/min dane




kalek li ser hewîyan..." Ev gazin û ramana han dengbêjan anîne ziman. Lê ji ber ku jin di nava civakê de, wek zilam ne li pêş bûne, van kilaman ewan gotine lê? Sitranên wan bi dengê zilaman di dîwanan de hatine gotin. Nimûne û mînak pir in. Kilama Hesenê Muso, Dayîkê, Bavê Fexrîya, Cembelî, Miho, Herdema Kirtakomê û Xalê Cemîl û bi sedan.

Her wisan. kilam û destanên Roma reş û komkujiya herêm û eşîretan ji Mehabadê, Dêrsim, Zîlan û Şêx Seîdan. Iro jî teknêk û çapemenî heye ji dîsa kilamên li ser Şoreşê hêj jî bi destên hostayên muzîk û dengbêjan tên gotin. Bi kinasî me hinek li ser mijara dengbêjan hin tişt gotin, lê di kilamên dengbêjan de, em ê şiroveya kilaman de bînin ziman ka çi gotine. Kilamên şeran,evinî û li ser Roma reş û serhildanên kurdan.Emê şiroveya gotin û kilamên dengbêjan bikin. Dibe ku bi dehan pirtûk li ser çand û hunera kurdî di salên dawî de hatibin nivîsandin, lê ez bawer im ku li ser şiroveya kilaman kêr hatibe şirovekirin. Ji ber wê çewan pirtûkên olî û yê dirok, û wekî din ku tên şirovekirin, ka çi dibêjin. Êş û azara civakê, kêf û şahî şer û pevçûn keça kurd çi xwestiye mirov dikare vana şirove bike û bibe hest û daxwaza wan. Min jî xwest ku bi tevayî nikaribim ji di deryayê de dilopek av be ji binivîsînim. Lewre ez jî kesek ji vê civaka me kurda me. Di nava malbat, gund, medrese û jiyana azadîya gelê me û min jî bi salan ev êş û zindnan kişand. Pirtûka li ser jiyana civakî, her wisan roman û pirtûka helbestan nivisand. Lê dema ku min kilamên



dengbêjan, yên hemû herêman guhdarî kir, bi rastî ev nivîs û jiyana min de, hîn kêmasî û valahî ma. Lewre dibe ku bi dîtin û çavên îroyî me li bûyer û civakê nihêrî an jî wek sîyasî lê mêze kir. An jî li şoreşên der ve û nivîsên wan xwend lê ne bigorî sosyolojîya îroyî ku şirove li civaka xwe binhêre. Dibe li gorî îro zelal û derfet tune bûne. Lê mirov ku dengbêjan guhdarî bike û bi fikra netewî û civakî bifikire, xezînekî mezin e ji bona me.



Jiyan û şirova Evdalê Zeynîkê

Evdalê Zeynîkê di sala 1800î de li Agirîyê, li navçeya Dutaxê, li gundê Cemal verdîyê ji dayik bûye. Navê dayîkê Zeynê, bav Silêman e. Di 3-salîya wî de bav diçe ser dîlovanîya xwe. Ji ber wê ku ji alîyê Dayîkê ve hatiye xwedîkirin û wek Evdalê Zeynîkê tê gotin. Piştî 30-salîya xwe xewnekê dibîne ku dewrêşek hinek garis didê ku bixwe. Serê sibê ku radibe her wekî ku di cîhanek din de ye. Kilaman dibêje, diçe govend û dîlanan. Navê wî



li herêmê belav dibe. Sirmelî Mihemed Paşa nebîyê Îshaq paşayê Bazîdê bûye. Li Agirîyê navçeya Zêtkî (Elaşgîr) li koşka Torpa qeleyê de dijiya. Mihemed paşa nav û dengê Evdal dibihîze û fîne dîwana xwe. Dema ku guhdarîya Evdal dike, matmayî dimîne. Dibêje "Xwuda ev çi deng û sewda ye" her wisa navê Evdal li dîwanên herêmê û derdoran belav dibe.

Dengbêjên herêman tîne davêjin ber hevdu lê kesekî nikaîbûye ku li hemberî Evdal sitrana bibêjin. Evdal rojekê diçe Xamura Agirîyê, Gelê ermenî bi kurdan re dijiyane û di nava hev de cînar bûne. Keçek ermenî bi navê Gulê dengbêjek bi nav û deng bûye. Ji malbatek mezin û xanedan bûye. Ew û Evdal davêjin ber hev du. Di dawî de Gulê biryara xwe dide ku bi Evdal re bizewice. Piştî zewaca Evdal û Gula bavfîle êdî sitêrka Evdal hinekî din diçilwile û ronî dide. Temo ne lawê Evdal bûye di pêçekê de dibinin û didine Evdal. Evdal Temo xwedî dike her wekî ku lawê wî ye, li her derî bi xwe re digirine.

Dûre Sirmelî Mihemed Paşa ku li Xozanê zîhayek (Merê ejdehar) pê vedide Mihemed paşa diçe ser dilavanîya xwe. Koşk û Sera û desthilatdarîya navxweyî ya kurdan jî di wê demê de ji hev belav dîkin. Dîwan, dengbêj û heya medresên wan û hemû bawerîyan wan ve ser û bin dîkin. Her wisan gelên ku di nava kurdan de jî ji van ferman û kirinan para xwe digrin. Jiyanê Evdal jî ber bi malkambaxîyê ve diçe. Ava reş tê ser her du çavên wî û nabîne, dikeve xizanî û bêxwedîfîyê. Temo destê wî digre û digirîne. Kesek qulingekî per û baskên wî şikestî bûye, tînin mala Evdal. Evdal xwe û quling wek hev dibîne. Ew jî wek quling diqêrîya li govend û dîlanan bû. Quling jî li hewa û li zozanan bû lê îro? Ew jî ketîye xizanî û feqîrîyê

Evdal, bavê Temo siwarê kovî, bi van hest û bûyerên ku dibîne, bi temenê 113-salîya xwe de diçe ser dîlovanîya xwe.

Evdalê Zeynê bi sedan kilamên evîn û evîndarîyê gotiye. Stîl û meqamên Evdal ji ewê rojê heya îro, bi teybetî dengbêjên herêma Serhedê wek pîrtûkxane û medreseyekê heya îro hatiye. Bi dehan dengbêjên wek Mistê Heyran, Ferzê Mîlazgirê, Reso, Şakirê Bedîh, Huseynê Orginosê,

Şeroyê Biro, Karapetê Xaço, Ozan Merûf, Zahir, Mihemed Arif û bi sedan dengbêjên mayîn ku li ser stîla Evdal kilam gotine. Kilamên wî li radyoya

Erîvan, Bexda, Îran û li herçar deverên Kurdistanê bûne meqam û awaz. Bi kurtasî Evdal wek pîrê dengbêjan hatiye binavkirin. Iro jî di televîzyon û radyoyên kurdî de Dîwana Dengbejan bi navê Evdalê Zeynikê tên li darxistin. Gelek nivîskarên kurd wek Yaşar Kemal, Mihemed Uzun, Ahmed Aras, Bulend Gunduz ku belgesela wî çêkiribû û li ser jiyana û hunera Evdal pirtûk nivîsandine.

Me li ser Evdal hîn şiroveyên xwe anîn ziman lê em keda xanima Evdal Gula Bavfile jî çend gotin bînin ziman. Keda Gulê wek jinek dengbêj em ji bîr nekin. Lewre gelek kilam û awazan afirandîye. Bûye sembola jîna Kurd, Ermen û yên mayîn. Gelek jinên kurd kilamên Dengbêjîyê afirandin û gotin... lê? Zilaman kilamên pîrekên kurd li dîwanan gotin. Em dibînin ku jîna kurd êdî cîhê xwe di nava çand û huner, siyasî û leşkerî de girtiye. Her wekî ku arama dilê Evdal û Gulê hatibe cîh.

Lê mixabin ku Evdal û bi sedan kesên wek wî di dema eşîrî û mîrekan de jiyane. Wek îro netew û sazîyên wê demê nebûne, ji xwe gazin û lewme jî ji wir e.

Dema ku mirov jiyana Evdalê Zeynikê û şirova wî bike, mirov ê du potreyên Evdal bibîne. Yek Evdalê Zeynikê î ciwan, dengbêjê Sirmelî Mihemed Paşayê Zêtkî, Kela Topraq qele ya navdar bibîne. Weke deng û sewta qaz û qulingên bihara kilamê evîn û evîndaran û şahê dengbêjan.

Evdalê duduyan Evdalê jar, çav nabîne, xizan û bêkes e. Sirmelî Mihemed Paşa jiyana xwe ji dest daye, dezgah û desthilatdarîya mîrekên kurd belav kirine. Bi tevî Temo ku bi zarofî de li bal wan bûye, bi destê Evdal digire û digêrîne. Dema ku em Evdal tarîf û şiroveya wî bikin, Evdal di kilama xwe de xwe fîne ziman. Ka em çend gotinê ku anîye ziman bi we re par ve bikin û dûre şirove û rewşa wî bînin ziman.

Benda kilamê

Kilama Quling:

Quling tu ji ku tê ji Leterê

Te hêlîna xwe çêkirîye li pêşberê Şaneşînê vê sivderê

Ka were em bi hev re dia bikin ji Rebê jorin

Bila çavên min vebe, baskê te bicebire

Li ba Xwida bila miraza min û te bavêje koşê vê tefferê

Ka were em herin ser şêx û zîyaretan bigerin

Lê kanê şêx û zîyaretên dewra berê?

Şirove

Evdalek çav nabîne ketîye feqîrî û bêkesîyê, quling jî baskê wî şikestî ku nikare bifire, Temo quling anîye malê bal Evdal. Evdal di şexsîyeta quling de xwe dibîne. Lewre quling jî dema ku li hewa difirîya bi refên xwe ve, bi bihara dihatin Welatê Serhedê zozanan û çavkanîyan digerîya. Avên sar vedixwarin, lê îro jî ketîye nava dest û pîyan. Serpêhatîya herduyan yek bûye, lewre quling li hewa difirîya, ji felekê re digot 'xwe bide alî'. Evdal jî Gula Qîzan û Bûkan bû ozanê govend û dîlanan, li cemaetên rusîpî û maqûlan bû, lê îro kes guh nadê. Berdewamîya bendek kilama Evdal.

Benda kilamê-2

Quling tu ji ku tê ji Mêrdînê

Te hêlîna xwe çêkirîye li pêşberê şaneşînê

Quling min dî şalûl dixwend bilbil jê re tew tew dikir

Qijikê baskê xwe dawdişand devê xwe xistibû kewa vê birînê

Wayê li min

Şirove

Evdal ji Quling re wiha fîne ziman. Di hemû kilamên dengbêjan de û di helbestên kurdî de xweşîkbûna şalûl û bilbilê tê kirin. Dema ku şalûl dixwîne bilbil li ser hêlîn û darê ew jî dixwîne. Bi deng û xweşîkbûna şalûlê re lewre bi gotinek bav û kalan "Serafê durê (Kevîrê cewher) durê nas dike. Lê li alîyê din qijika malxirab ku dîsa gotina bav û kalan "Ji serê qijikê qelî çênabe" Qijik jî qîştina wî ye ketiye nava laşan û birînan nukul dike. Şalûl xwendîye, bilbil tew tew kiriye jê re ne xem e.

Ne bi tenê qijika reben 'mirov jî' hene wek şalûl, bilbil û qijikê ku ne xema wan in. Evdal xwe û quling fîne ziman. Ew jî demek li dîwana Sirmelî Mihemed paşa bûye kilam gotiye. Mîr û maqûlên li dîwanê jê re tew tew kirine, bi mînder û doşek bûye. Li dewet û govendan gerîyaye nav û dengê wî belav bûye. Quling jî dema ji Serhedê ku ref bi ref kişîyane welatê Germistanê Beruyê. Li hewan yek ji wan dida pêşî wek rêberek ku rê nîşanê refên xwe bida. Di ser çiya û zozanên bilind re difirîyan. Deng û sewta wan diketin daristan û zinaran. Kewên gozel, qaz û hemû balendeyan ji wan re tew tew dikirin.

Dengbêjan di kilamên xwe di anîne ziman "Qirika Kewa min a narîn weke qirika qaz û qulangan" Lê? Ti carî nehatîye gotin weke "Qirika qijikê". Lê Evdal li ser xwe û quling ev bend hûnandine û rewşa xwe û ya

qulin wek hev daye dest. Di vir de hozanê bi nav û deng ne bi tenê jiyana mirovan fîne ziman, her wisan xweza û ajalan jî di nava sitranên xwe de vedibêje. Em li bendek kilamê bibînin ka çi dibêje.

Benda kilamê

*Quling her çar mehên zivistanê, cîh û meskenê te Suwêreg e
Quling bes e baskên xwe bi ser min de nehejîne, li ba neke
Tu ciwanî bilîndaya xwe nexape, ma qey tu nizanî
Ewê ku herçar çavan û du dilan jî hev du diqetîne,
Xwuda Rebê jorîn qoce felek e
Way li min*

Şirove

Mirov dema li vê benda wî ya dawîya kilamê guhdarî dike, çewan ku me di serî de anî ziman, ku du Evdal in yek ciwan û bi nav û deng. Her wisan jî du quling in, dema ku Evdal li ber çîyan, zozan û çavkanîyan kilam gotiye, refên qulingan jî li dev avan qingîyane. Li hewa dema ku firîyane Evdal li wan temaşe kiriye. Çewan ku gotîbe heyran çiqas dengên qulingan xweş û bilind difirin. Lê? Qulingê malxirab jî nizanîbûye ku rojek were kalî, korî an jî xizanî were serî. Dema ku mirov dibîne Evdal jî her wekî ku li xwe mikûr tê. Çewan min jî nizanî bû, an jî nedi fikirîm ku rojek were, ez kal bim, çavê min nebînin. Heval û hogirên min ên ku li dora min bûn, tev çûn. Ew dîwana ku camêr û canik li hev kom dibûn. Min jî wan re sitran digot.

Quling mala te xirab be ma te jî nizanîbû ku rojek were tu ê ji ewr û esmanan werî xwar. Baskê te şikestî be gelo tu qet nefikirî.

Di kalama quling de dema ku dibêje di dawîya her bendekê de, berîya ku hahî bike û biqedîne wiha dibêje

*Ebur nabe Temo lawo ebur nabe
Ji destê qiz û bûkên vî zemanî derbas nabe
Wey kalîyê wey korîyê
Temo lawo bila qeda were
Li herçar rojên feqîrîyê*

Evdal mabesta wî ya ku feqîrî û xizanîyê fîne ziman, ne ji bona mal û serweta dunyayê ye. Xizanî û feqîrîya ku dibêje bêxwedîfî, bêrûmetîya di nava 'civakê' de ye. Ew dost heval, eşîr mîr û rûsipîyên ku dîtibû û bi wan re hevalfî kiribû, ji bilî Temo û qulingê baskşikestî bi tenê mane.

Seydayê Xanî çewan ku anîye ziman:

Ger hebûya ji bona me xwidanek

Alî kerem lefîf û danek

Îlmu huner û kemal û ezan

Şîr û xezel û kitêb û dîwan

Melayê Cizîr:

Feyza me şubhê nîl e, em dicle û ferat in

Ger şeyx û wer îmage ferayê min keşakeş

Şuxa ku ez li bendê dîlgirtîye kemendê

Lefîf û zuhr û sîma ebr û hîlal û mehweş.

Em di hemû peyama û gazinên zanyarên welathez de dibînin ku ji bêdewletî û bêxwedîfîyê digazin. Lewre fikr û ramanên netewî dane jibîrkin. Ji ber wî ku Evdal ewqas ji bêxwedîfîyê gazine kiriye.

Em di şexsiyeta Evdalê Zeynikê de dibînin ku hemû dengbêj, hunermend û kesên ku ji bona civaka xwe kar û xebat kirine, çand û huner û zimanê xwe heya îroyî parastine. Wan jiyana xwe ji dest dan û çûn, em ji hemûyan re ji Xwuda rehmet, ji kesên ku hêj jî li jiyane ne û ji bona azadî û rûmeta gelê xwe têdikoşin, ji wan re jî rojên şahî, xweşî dixwazin.

Hêvîdar in ku em li ser gazine û gotinên Evdalê Zeynikê gelek bifikirin û rûmeta hevdu bizanibin.

Bi gotina şaîrekî me bi dawî bikim: “Ger ku bimir ji bîr nabim, lê ji bîr bibim, dimrim.”




Du ciwanên kurd bûn endamên parlamentoya Norwecê:

Sahar Aydar (32 salî) biçûkîya xwe ji gundê Xofê, Yunak/ Konyayê bi malbata xwe ve hatine li Norwecê mane. Li ser navê Partîya Sor (Sosyalîst) wek parlamenter hat hilbijartin.

Manî Huseynî li ser navê Partîya Karkeran a Norwecê (Partîya Sosyal Demokrat) 33 salî, ji Qamişlo berî 23 salan bi malbata xwe hatibûn Norwecê. Huseynî li Norwecê xwendina xwe ya amadehî û navîn bi dawî kir, piştî re jî Fakulîteya Zanistên Siyasî xwend. Manî Huseynî di 2011 an de wekî dîplomatek stajyer li Balyozxaneyê Norwecê ya li Abu Dhabi kar kiriye. Wek parlamenter hat hilbijartin.

Partîya Sosyal Demokrat ku piraniya dengên girtî û di demê kurt de bi du partiyên din re, hukûmetek hevbeş, biryar da.



Pîjok kovara çandî, hunerî, ziman û edebî bi şêxbizînî, ji alîyê kurdên şêxbizînî yên ji Heymaneyê ve derdikeve.

Kesên kovarê derdixin û serpereştiya kovarê dîkin ev in:

Onur Ozdemîr, Ramazan Comer Tetik, Mustafa Başaran, Erhan Akbenlî, Mehmet Okçu, Rênas Burhan Demircan.


Em wek hevkarê kovara Bîrnebûnê bi weşandina kovara **Pîjokê** dilşa ne û ev kesên ku kovarê derdixin pîroz dîkin û bi hêvîya berdewamîya weşandineka dîrûdirêj. Em ji hevkarên kovarê re serkeftinê dixwazin.

Red.

Tenêtiya westiyayî

ez
li qêrîna şeverêşeke kor hatim
dinyaya derewîn
li nav daristanên keskeşîn
pelê dareke hişk im
di xweşbînî û dilpakîya xwe de
mîna sîtavka golege
zelal im
her kêlîyê
li nav xumxuma bayê deryaya bi hêrs
avjenîya berxwedanê dikim
kevoka aşîyê
li navbera heft parzemînan
difirînim
berê karwanê serkeftinê
ber bi çiyayên qendîlê ve
dizivînim
li ser secadeya nimêjê
duayên eşqa îlahî
dixwînim
li çol û beyarên تنها li heqîqetê
digerim
li ser rêyên bi kelem û strî bêrawestan
dimeşim
erd di bin gavên min de
qelişî
jiyana ez dijîm xewneke
vikûvala ye
sîya tenêtiya wêran
di nava min de westiya ye
dilê mesûm
li nav hest û ramanên reşbînî
diperpîte
temenê min bi êş û keservedanan





bihûrî
her şev
li xewnereşkên xof di tîrsa xwe de
vedicinikim
xeyalên bêbinî
bi tevna êşên kambax hatiye
hûnandin
çirûskên şewqa fînda odeya min
vemiñn
qayika hêvîyên geş
li nav pêlên bareşa felekê
serûbin bû
bilbilê baxê hezkinê
di gewrîya feryad û fixana xwe de
nalenal e
berî mirinê ez bêreng û bêdeng
mîrim
her roj
dergûşa dayika min ji pêşîrê demê
êş û janê dimije
mîn
hemû ferhengên bîranînên xwe
şewitandin
ez ê
bejna şevistanên qefilî
bi kirasê awaza stranên germ
bipêçim
fîrêjên tava berbangên rûgeş
di hembêza giyanê pîroz de
veşêrim
û li pey mirina xwe
helbestên kor û kulek û birînkûr
bihêlim

Xizan Şîlan



Bihîstina şînên me li xerîbîyê

Altun Başaran

Ela **Rehmê**, nebîya bapîra min Rawa Mestî Ali Begê (Ejê), xasîya min, bapîra lawikên min, keça meta min a Rehma Xelî Beg. Ela Rehmê şînên xelkê bi kilamê xwe şîrîn dikir. Bi kilamên xwe yên şînan, bi navûdeng bû. Şarebûna wê ji dapîra wê Ejê vir da têye. Şarebûna xwe bi mirina birayê xwe, Şêxê, bi kezaba xwe Samî dest pê kir. Elê sohbet xwaş bû, tejrîrê bû, tevin kiribû. Wextek tevnên xwe dikirin pîj û kirkîta di desta da şîngaqîng bû. Carna ku dengê xwe jî helfîna tebû seyraneke!

Min jî li ser Elê got:

Ela metkê min ê ramedîye li ser piştê,

ciya westyaye

Bengzê mirnîyê çîng lê têye

Li vê demê nawêm li dema berê

A cêzî heft keçikan bikira bi teşîyekê wa

Ê bi mirnîya Samîyê xwe bi şûnda bi keder e

Tama devî xwe herimîye

Ma here bogirê xwe bide bogirê

Ma rakeve têrî xwewo!

Roka ku El mirî, Rawê Mexmî Ewî Mecê (Rabîye Erdaş) ji min re telefon kir û bi ser min de şîn kir. Ji min re sitira, weng got:

Anê anê Elê anê
Elê Rahmê him a siwar him a sekmanê,
Min got çîya ye çîya ye bûka etkê min a çawuşê çîya ye
Ordagê kirîye dengekî li golê bi giha ye
Elê Rahmê jîneka ji hêsin e
Derdê xwe li ser Samî û Serapa xwe helhaye
Bejna Samî kekê min î dirêj e mîna dara zeytûnê
Ma biruze li Belgirata şewitî li wê şûnê
Xopana posta li kekî min xistîye mîna qurşûnê
Heta ez ê li dunê xwaş im ji bîr nakim bavî Serdêr, zavê Altunê
Min go banî banî Samî keko banî
Mersedesa kekî min î ji Îsveç ta tîye herd helanî

Agir vî mala mêrkê gawir keve
Araba kekî min li rê rast anî
Temel Samî kekî xwe ji bîr nakim
Ê vê dera cemîyetê keve deng ke bi çil zimanî

Were wêda Samîyo were wêda
Dî qirara mala bavî min ra derda xwe da serî derda
Serapa kekî min a ku wun nas nakin
Metê xwe qurban be yê mîna încîya ku di nav zêrî zer da

Hetanî ku ez a xwaş im li ser herdê me
Ez a hertim bêjim posta gêwir hat bi berda
Min go li nav nava Samîyo li nav nava
Şerê felakê yî di qirara mala bavê min ra helfîne gava

Ez qurbana tu hînî ciwan î îşê te û Serapa te çî ye li nav kilama, li nav zirava
Ez qurbana pîyê ku qerimîn li ser dîraksîyon sê royan û sê şevan
Qurbana doma xewê ku keta çava
Min go va çiyana çîya sêvandî êmlîkê biharê du gerandin

Koma kekê min li nivê rê cerx kirin
Nîvî anîn, nivê şunda şandin
Ax mala bavê min birayê xwang qurban
Çima qeda li xwe nenaye

Min got li belê Samîyo li belê
Dî qirarê çifte malê bavî min ra
Xoce yî dixwîniye înce selê

Ez qurban, tu bi bav î tu bi dak î
Va çî mirinîya te bi ecele ye
Samîyê kekî min î ji Îveç ta hatîye
Î ku Serdar Serapê xwe ra bike relê

Revendo, tu têtî Şpa...

Heinrich Böll

Wergera ji almanî: Nuh Ateş

Gava ku arebe sekinî, motir hîn demekê dikire guregur. Li derva, li cîhekî deriyekî mezin bi lez hat ji-hevkerin. Di pencereya xişbûyî ra işqê dida hundirê arebeyê û min niha dît ku ampûlê li asraxê xiş bûbû, tenê didanê çerxa wê di devê ciwatê da mayî bû û çendek têlikên biriqokî tev bermayiyên caminî. Paşê guregura motir bi dawî bû û li derva werîniya dengekî belav dibû: „Mirîyan bînin vira, li ba we mirî hene?“, „Lenet lêbibe“ ajotvan lêvegerandiye û gotiye, „Ma hun êdî tarîfiyê êlan nakin?“ „Êdî tarîfiyê tu feydeya xwe tune, çima ku bajar bitûn mîna meşalekê dişevite“ wer qîrîyaye dengê bîyanî. „Min pirsîya ka mirîyên we hene?“

„Nizanim.“

„Mirîyan bînin vira, te bihîst? û yên din bi merdivanê da kaşbikin bibin jor, salona xêzkirine, tu têgihêştî?“

„Erê, erê.“

Lêbelem ez hîn nemirîbûm, ez yek ji yên din bûm û wan ez bi ser merdivanê da kaş kirim û birim jor. Berîyê me dan mabeyneke dirêj û kêmrônî ya ku diwarên xwe bi boyaxên rûnî hatibûn siwaxkirin. Çengelên kincan yên xwar, reş û kevnemode di dîwaran da hatibûn kutan û derî hebûn yên bi lewheyên bi nîşanên wekî VIa û VIb. û di navberê wan derîyan da, bi biriqîniyeke nermayî Madea ya Feuerbach di bin camê û çarçi-

veye ke rêş da li dûrîyê mêzê dikir. Paşê derîyên bi nişanên Va û Vb û di navberê wan da resimê Strîkêş, fotografîyeke şahane û sorbirqokî di çarçîveke qehweyî da.

Stûnê mezin jî yê li pêş derenceyê li wir hebû û li pişt wî dirêj û zirav, şahane çêkirî, gîpsê replîkayeke Partehonê zerbirqoqî, rasteqîn, enfîk û her tişt wekî ku mecbûr qewimîbûya dihat: Leşkerê yunanî pirrengî û metirsîdar wekî dîkekî bi perik û li derenceyê bixwe, xwiya dikir. Li ser diwarê yê ku bi boyaxa ronî sîwaxkirî gîştîk bi dorê bi darda kiribûn: Ji Mîrê mezin yê herêmi bigire hetanî Hîtler...

Û li wê derê, di korîdora piçûk ya teng da, wexta ku ez nihayet çend gavan şûnda dîsa rasterast li ser sedyaya xwe bûm, wênêyêkî pirreng yê qirâlê Prusayê, Frîtzê meşhor bi unîformaya ji rengê keskî ezmên, bi çavên şewqdar û li ser sîng stêrka wekî zêr birqoqî.

Ez li ser sedyayê dîsa şaş hatibûm dirêj kirin û di ber rûwênêyên nijadî ra dihatim kaşkirin: Kaptanê bakûrî yê bi nêrîna qertelkî û bi devekî fehmkor, mozêlîyanîya rojavayî ya tozîkê jar û tûj, rûbikenê rojhelafî yê poz pîzavkî bi ximximikê dirêj yê profîla filmê çiyayî.

Û paşê dîsa korîdoreke din destpê kir, dîsa ez bo çend gavan li ser sedyayê xwe bûm, û berî ku barkêş bizivîrin merdîvana duyem mîn di wê navberê da ew dît: Heykelê şervanan yê bi xaça gir ya ji hesinê zêrîkî û li ser jî çelenga dafîkê ya ji kêvir.

Her tişt bi lez diqewimîya: Ez ne

giran bûm û barkêş vediheşîyan. Di encamê da: Dibe ku her tişt xeyalî bû, alafa min zêde bûbû, her de-re min diêşîyan, serîyê min, ranên min û dilê min pir pît dikuta, meriv çî nabîne gava ku alafa wî heldikîşe!

Lê wexta ku em ji rûwênêyên nijadî rabirtin, tiştên din bi ber çavên me ketin: Sê heykel yên Sezar, Çîcero, Mark Aurel li rû hev pir baş tevgerîya bûn, pir şahane hatibûn teqlîd kirin, bitûn zer û heqîqî, enfîk û teqlîdkirî li ber diwêr dawestîbûn. Û stûnê Hermes jî, gava ku em li goşê çerx bûn, li wir bû. Û ta li dawiyê salonê sûretê gir yê Zeus li alîjorî derîyê salona xêzkirine hatibû dardakirin, lê dîsa jî sûretê Zeus hîn li dûrê bû. Li pîyê rastê min di pencereyê ra şewqa pêffîya agir didît, ezman bitûn sor bûbû û ewrên rêş û qelaw rêzberîz radibirtin...

Û dîsa gerek bû ku ez berbi çep binihêriyam û dîsa min lewheyên li ser derîyan O la û O lb didît. Û di navbera derîyên qehweyî û kufîkî da min tenê simêlê Nîtzçe û serê pozê wî di çarçîweyeke zêrîn da didît. Ji ber ku wan nivê din yê wênêyê bi kaxizekê zeliqandibû û li ser kaxizê wer hatibû nivîsandin: "Emeliyeta sivik"...

„Eger niha", bi lez ez difikirîyam... "Eger niha", lebelê ew bûbû jî: Sûretê Togoyê, pirreng û mezin, pan mîna pêvadankeke kevn, çapeke keleş, û li pêş, li pêş xaniyên kelûpelên mustemlekeyan, li pêş reşîk û leşkeran, ewê han yê ku bêarmanc bi tîfînga xwe li wan deran dawestîbû, berî her tiştî gûşîyên mûzê yên kû pir gir û zindî hatibûn çêkirin: Gûşîyek li

çep, gûşîyek li rast, û li ser mûza navîn ya gûşîyê rastê tişt hatibûn çizandin, min ew didît; dibe ku min bixwe ji neçarî ev nivîsandibû...

Lêbelê niha derîyê salona xêzkirinê bilez hat jihevkerin û ez bi hêjandinî di bin bûstê Zeus ra ketim hundir û min çavên xwe girtin. Min qet nedixwast tiştekî bibînim. Ji salona xêzkirinê bîhna îyotê, gu, zibel û tutinê dihat û şemate pîr bû. Wana ez ji sedyaye deynîyam û min ji barkêşan ra got: "Cixarekê têkin devî min, li jor di berîya çepê da ye." Min hîs dikir çawa yekî berîya min di hev dida, paşê bû tîsniya hevek kibîrt û cixareya vêkefî di devê min da bû. Min ew dikişand. Min got, „Spas."

„Evana gîşt", ez difikirîyam, „ne defîl e. Nihayet li her lîseyekê salona xêzkirinê heye, korîdorên ku tê da niçikê kincdardakirinê yên xilûxwar û kevn bi dîwarên ku bi rengê hêşîn û zer siwaxkirî da hatibûn kutan. Lê li dawîyê, ev ne defîl e ku ez li dibistana xwe bûm, eger Madea di navberê VI a û VI b da aliqandî û simbêlê Nîtzçe jî di navberê OI a û OI b da bin. Bêşik qeydeyek heye li gor wê dîvê ew mecbur li wir bihê aliqandin. Nîzamnâme ya ji bo lîseyên humanîst li Prusyayê: Madea di navbera VI a û VI b da, li dera han Strîkêş, Sêzar, Mark Aurel û Çîcero li korîdorê û Nîtzçe li jor, wan li wir fîlezofî hu dikir. Cihê



keçên cîwan û wêneyekî Togo yê rengîn. Strîkêş û herema bûste

jinan jixwe bi dirêjîya nîfşan wekî amûrên baş yên dibistanan tîn hesibandin. Û bêşik ne tenê ez ew kes bûm yê xwedîye wê fikrê bû ku li ser muzekê wer nivîsibû: „Bijî Togo. Hek jî yên ku li dibistanan tîn kirin tim wekî hev in. Û wekî din derfet hebû ku alafa min hebikişe û ez bi xewn bibînim."

Tu derên min niha nediêşîn. Di arebeyê da pîr neçê bûbû, gava ku hûn bi ser kêrt û kortên piçûk da biajon, her carê ez diqîrîyam, kêrtûkortên mezin li gor wan baştir bûn: Areba heldihat û dadiket mîna keştiya di korta navberê du pêlan da. Lê niha derzîyê tesîra xwe dinimand ya ku li derekê di tarîyê da li piyê min xistibûn: Min hîs dikir, derzîyê çawa çêrm qûl dikir û li jêr çawa ranê min pîr germ dibû.

„Ne mimkun e ku ev rastî be „ez fikirîyam," „ne mimkun e evqas kîlometro areba çûyibe: Hema-hema sih kîlometro. Û Ji xeyrî vê jî: Tu qet tiştekî his nakî, tu hisek ji te

ra nabêje, tenê çav, tu his ji te ra nabêje ku tu li dibistana xwe yî, li dibistana xwe ya ku te berî sê mehan terikandibû. Heyşt sal ne hendik e, divîya bû ku tu piştî heyşt salan vî her tiştî tenê bi çavan binasî?"

Di paş girtokên çavan yên girfî da min her tişt careke din didît, ev mîna filîmekî derbas dibû: Mayîniya jêr ya kesk siwaxkirî, ji merdiwanê berjor zer siwaxkirî, heykelê şervan, mayînî, merdiwana berjor, Sezar, Çîçero, Mark Aurel, ...Hermes, Simêlê Nîtzçe, Togo, Rûyê Zeus ...Min cixareya xwe tû dikir û ez diqîrîyam, qîrînî tim baş bû, divê meriv bi dengê bilind biqîre; qîrîn şahane bû, ez diqîrîyam mîna ku dîn bûbûm. Gava ku kesek bi ser min da xwarve dihat, min dîsa jî çavên xwe venedikirin, min bîneke xerîb hîs dikir, germ û neçê mîna bîna titûn û pîzavê û dengê nizm dipirsîya: "Çi dixwazî?" „Tiştêkî vexwarinê", min got, û cixareyeke din jî, di çenteyê li jor da." Dîsa yekî çenteyê min di hev dida, dîsa hevek kibrît kire xîşinî û kesekî cixareyeke vêkxistî kire devê min.

„Em li ku derê ne?" Min pirs kir. „Li Bendorf." „Spas", min got û cixare kişand. Bi rastî di encamê da wer xwîya dibû ku ezî li Bendorfê bûm, yanê li mal û eger ku alafa min pir zêde helnekiştiba qatî bû ku ezî li Liseyeke humanîst bûm. Bêşik dibistanek bû. Dengê li jêr wer neqîrîyaba: "Yên din herin salona xêzkirinê!" Ez yekî ji yên din bûm, ez dijiyam, wer dixwîya yên ku dijiyan yên din bûn. Salona xêzkirinê li wir bû û şayê min rast bihîstiba, çima

min dê rast nedîtiba, paşê ev jî rast bû kû min Sezar, Çîçero û Mark Aurel naskiribûn û evîya tenê dikanîbû li lîseyeke humanîst bûbûya. Ez bawer nakim ku van kesana li salonên dibistanên din bi diwaran da kiribûna.

Nihayed wî ji min ra av anîbû: Dîsa bîhna tûtînê dihate min û bîhna pîzavê ji rûyê wî dihat, bêyî ku ez bixwazim, min çavên xwe vekirin: Rûyekî westiya, kal, kurnekirî li jor ûnîformeya agirkûjîyê li pêşberî min û dengê kal û nizm got: "Vexwe Hevalo!" Min vexwar, ew av bû, lebelê av nuwaze ye, min tamma qawên metalî li ser lêvên xwe hîs dikir, û hîskirineke baş bû, gelek avê din jî bi pêy xist. Lêbelê merivê agirkûjîyê ji devê min kişand û çû.

Ez qîrîyam, lê ew li min venege-rîya, bi halekî westiyayî mil kuta û çû. Yekî ku li kêleka min dima, bi dengê nizm got: „Qîrinê tu feydeye xwe tune, ava wan nemaye, bajar dişevite, tu jî dibînî." Min di nav tarîfîyê ra didît li paş perdeyên reş, sor li pişt reş, mîna di sobeyekê vêketî da, gava ku meriv komira nû dike wê. Min ev didît: Erê, bajar dişewifî.

„Navê vî bajêrî çî ye?" min ji yê ku li kêleka min dima pirsîya. Wî got, "Bendorf" e. „Spas." Min rasteder li ber xwe li rêzepencereyan dinerîya û carcaran jî li asraqê. Asraqê hîn bêkemasî bû, sipî û serast, kenar bi gêçêke zirav bi avayê klasîk hatibû perwazkirin. Lêbelê ev aşkere ye asraqê wengîna klassîk li hemû dibistanan, li salonên xêzkirinê, kêmtir li lîseyên humanîst hebûn.

Lazim e ez qebûl bikim ku ez îlî salona xêzîrînê ya lîseyeke humanîst li Bendorfê ramediyame. Li Bendorfê sê lîseyên humanîst hene: Dibistana Friedrichê Mezin, Dibistana Albertus û -belkî ne pêwîst e ku ez wê bi nav bikim- belê ya paşîyê ya sêyê, Dibistana Adolf Hitler e. Ma li dibistanê sûretê "Friedrich yê Mezin" sûretê Friedrichê Kalemêr yê bi taybetî pîrreng, bedew û mezin li walahîya merdivanê nehatibû darda kirin? Ez li vê dibistanê bûm, heşt salan, lêbelê çima li dibistanên din ev sûreta li eynî cihî nekanibû wer zelal û balkeşandî bihata darda kirin, da ku bal bikişanda, gava ku meriv bi rêza pêşî ya merdivanê da heldikişê?

Li derva, min dengê bombeavêtê dibihîst. Wekî din hemahema bêdengî bû. Tenê carcaran xîşîniya pêtiyan dihat bihîstin û di şeverşîyê da li derekê sêgoşeya xanîyekî heldiwêşîya. Bombeavêtê kêmdeng û rêzberêz diavêt û min digot: Bombeavêtê baş! Ez dizanim ev neçê ye, lêbelê ez wer fikirîyam.

Xwedêyê min, bombeavêt çiqas aştkar bû, çawa rehet: Tarî û neçê, orgileke nermayî, hemahe-ma baş, giran û nazdar. Li gor min bombeavêt, her çiqas gule berdi-da jî, ji aliyekî da jî xwedîyê kûbarîyê jî bû. Dengê wê wekî bi edeb di hate der, rasterast mîna şerê di pirtûkên weneyî da... Paşê, ez li ewê fikirîyam ku kêmuze de çiqas navan dê bikaniya li ser heykelê şer cih bigrin eger ew carek din bihata danan, li jor bi xaçeke ji hesinê zêrkirî û hîn mezin û çelenkek ji kevîr û ji niçkava

ev hate bîrîya min: Eger ez bi rastî li dibistana xwe ya kevin bûma, hîngê navê min jî dê li ser cih bigirta, li ser kevîr kutayî û di salnameya dibistanê da li bin navê min wer bihata nivîsîn: "Ji dibistanê çû meydana şer û ket ji bo..."

Lêbelê min hîn nedizaniybû, ji bo çî û hîn min nedizaniybû ku ez li dibistana xwe ya kevn bûm. Min dixwast ku ez vê niha vekirî bizanim. Li cihê heykelê şervanan tiştêkî taybetî xwîya nedibû, tiştêkî ku bi ber çavan biketa, ew wekî li her derê din bû, ew heykelekî şervanan bû, belê ew ji merkezekê hatibû peyda kirin. Min li salona xêzîrînê mêze kir, lêbelê wêne hatibûn rakirin, meriv dê li çiyê çend kursiyan yên ku li kuncêkî hatibûn lodkirin binihêre û yan li pencereyan yên zirav û bilind û pîr ji wana li kêlekê hev, sewa ku zêde fîrêj bikeve hundir ya ku ji saloneke xêzîrînê ra hewce bû? Dilê min ji min ra qet tiştêk nedigot. Ne hewce bû ku wî tiştêk bigota, gava ku ez li qulûbeyê mayîbûm ya ku min lê heşt salan vazo neqîşandibûn û nîşanên nivîsê hukiribûn û teqlîdên vazoyên romayî yên camînî, zirav, kubar, pîr xwaş yên ku mamosteyê nîgarîyê li ser kursîya xwe bicihkiribûn, û her çeşîd nivîs, çemberî, entîq, romî, îtalî.

Min li tevayî dibistanê biqasî van seetan ji tiştêkî din nefret nedikir, min bi seatan acizî tehemul dikir û qet nedikanî vazoyan xêz bikim yan herfan binivîsim. Lêbelê nîfirên min li ku man, li ku bû nefreta min li



hemberî dîwarên mat-
deng, eciz? Tu deng ji
hundirê min dernediket,
û bédeng min serî badi-
kir. Tim û tim min rêş dikir,
qelem tûj dikir, rêş dikir... Qet ne tiş-
tek...

Min rind nedizanî ku ez çawa
bifindar bibûm. Tenê min ev dizanî
ku min nedikanî pîlên xwe bilivînim
û ranê rastê jî, tenê yê çepê hen-
dik. Min digot qey wan pîlên min
bi bedena min va pêçandibûn,
wer qeym, min ji ber nedikanî
wan bilivînim. Min cixare duyem
tû kire mabeyna navberê tûrikên
pûşpelaxê û hewldida ku pêyên
xwe bilevînim, lêbelê ew evqas pir
diêşîyan ez ji ber mecbûr qîriyam,
min qîrinî berdewam kir, qîrinî tim û
tim baş bû. Ez hêrs jî bûbûm, ji ber ku
min nedikanî pîlên xwe bilivandan.

Paşê pizişk li ber min dawesti-
ya, wî berçavika xwe derxist û çav
avête min. Wî qet tişteke negot. Li
paş wî merivê agirkûj sekinibû yê ku

av dayîbû min. Wî bi pistepist
tişteke di guhê pizişk da got û
pizişk berçavika xwe bi xwe
da kir: Min çavên wî yên gir
û gewr bi nîskokên sivik cir-
fonek di paş camên qalîn
yên berçavikê didîtin. Wî
demeke dirêj li min nihêrîya,
evqas dirêj, ez ji ber mecbûr
bûm ku lê mêzenekim û wî
bi dengekî kêmbilind wer
got: "Pêçekê şûnda dor
dihê we..." Paşê, wan ew
ê li hêla min helinan û birin
paş texteyê ber dîwêr, min
li wan diniherîya. Wan texte
ji hev kîrin û çepraz danan
û nabeyna dîwar û texte
bi çarşeveke ser nîvîna nixi-
mandin, li pişt wê işqeke bi
şewq vêdike...

Qet tişteke nedihate bihîstin
hetanî ku çarşev helinan û ewê
ku li kêlêka min ramedîyabû hat
biderxistin, barkêşan yên bi rûyên
westîyayî û xemsar ew kaşkirin û birin
ber derî. Min dîsa çavên xwe girtin
û got, pewîst e ku tu têbiderbinî ka
birîna te çi ye û ka tu li dibistana
xwe ya kevn î. Her tişt bi min sar û
xemsar dihat. Mîna ku bibêjî ez di
nava mûzexaneyê bajarekî wêran,
di nava dinyake bo min bêxem û
bîyanî ra dihatim kaş kîrin, her çi qas
ku çavên min ew nas dikirin jî, tenê
çavên min.

Ma ev ne rast bû ku ez berî sê
mehan li vira rûniştibûm, min vazo
xêzdkirin û nivîs boyax dikirin, di
navberdayînan da bi nanê xwe yê
reçeltêdayî diçûm jêr û ji Nîetzçê,
Hermes, Togo, Sezar, Çîçero,

MarkAurel derbas dibûm, pir giran hetanî salona li jêr ya ku Madea lê aliqandibû. Paşê sewa vexwarina şîr diçûm ba gefînendeya sazgehê, Bîrgeler, sewa şîr vexwarinê di kulubeya piçûk û tarî da, ya ku meriv tê da, çiqas bi rîsk bûya jî, bikanîya cixareyek bikişanda. Bêşik yê ku li kêleka min dimayîbû dibirin jêr, dera ku mîrî lê dihatin bi cih kirin. Belkî mîrî li kulubeya gewr ya Bîrgeler ya ku bîhna şîrê germ, tozê û tutina Bîrgeler ya neçê jê dihat...

Nîhayet barkêş dîsa hatin hundir û niha wan ez rakirim û birim paş texteyê ber dîwêr. Ez dîsa dihêjyam, aniha ji dêrî bi hêjîneke sivik derbas bûm û bi derbasbûnê ra min dît ku ew rast bû: Li ser dêrî wextekê xaçek darda kiribû, dema ku navê dibistanê hîn Dibistana Thomas bû û wê demê wan xaç jêkiribûn. Lêbelê lekeke teze û reşezê li ser dîwarê bi şekila xaçê hişk û zelal mabû ya ku hemahema ji ya kevn qelstir û piçûktir ya ku hatibû rakirin, zelaltir xwîya dikir.

Hîngê ji hêrsa ra dîwar bitûn ji nûva siwax kiribûn, lêbelê tu kêriya wê nebûbû. Siwaxvanan tonê wê lihevneanîbû, xaç li wê derê mabû, qehweyî û zelal, lê dîwar bitûn pembe bû. Ew hatibûn azar kirin encax tu fêydeya wê nebûbû. Xaç hîn li wir mayîbû, qehwereng û zelal li ser pembeya dîwarê û ez bawer dikim sermîyana wan ya ji bo reng xelas bûbû û wan nedikanîbûn tiştek bikirana. Xaç hîn li wir mayîbû û gava ku meriv bala xwe baş bidaya, wî yê heta bikanîya şopake zelal û



xwar li jor beştê pîyê rastê biditiya yê ku bi salan çiloyêkî dara şîmşîr pê da dewîstîbû yê ku Bîrgeler dikiriye paş beştê, dema hîn îcaze hebû ku xaç li dibistanan bihatan dardakirin...

Evana gîştan di sanîyêke kin da bala min kişandibû gava ku ez di ber dêrî ra dihatim kaşkirin ya paş texte, dera ku işqeke ronîtûj vêdike. Ez li ser maseya emeliyatê bûm. Û min xwe pir zelal didît, lêbelê ez pir piçûk, nûreserhevbûyî, di cama ampulê zelal ya li jor da pitok û sipî, paketike ji rengê zibil, wekî embroyeke nazik ne ji rêzê: Ew ê weha li jor ez bûm. Pizişk piştî xwe berbi min kirî li ber maseyeke dawestîbû û li wir enstrument di-

hev didan. Merivê agirkûj yê bi ber û salmezin li ber textê dawestibû û di min ra dikenîya. Ew westîya û xemgîn dikenîya, rûyê wî yê bi pirç û qilefî mîna rûyê yekî raketiyayî bû.

Di ser milê wî ra, li pişt rûyê texteyê diwêr yê benîştokî, min tiştê didîf, cara pêşî min, ji kî ku ez li vî xanîyê mirîyan im, dilê xwe hîs dikir: Li cîyekî, di erzakxaneyêke bidizî yê dilê min da, ez kur û tîrsnak veciniqîyam û wî bitundî dikuta: Li ser texteyê îmzeyî min hebû. Li jor li rêza jor. Ez îmzeyî xwe nas dikim: Ew ji ya ku li mêzekirina di neynikê da xerabtir, pir zelaltir bû û tu derfeta min tunebû ku derheqî rastbûna îmzeyî xwe da şikdar bibim. Her tiştê din nedibû delîl, ne Medea ne jî Nîetzşe, ne profilê filîmê dînarîçî, ne mûzê ji Togoyê, qet ne jî nîşana xaçê ya li jor dêrî. Evana gîştik li hemû dibistanan wek hev bûn, lêbelê ez bawer nakim ku li dibistanên din ew bi destnivîsa min li ser texteyê binivîsin.


Gotin hîn li vir bû, ya ku me hîngê di şaşmayîya vê jîyanê da sê mehan berî vê, mecbûr wer dinivîsand: "Revendo, tu têtî Şpa..." Oh, ez dizanim, texte pir kin bû û mamosteyê xêzîkirinê azar gotibûn seba ku min rast dabeş nekiribû, nivîs pir gir hebijartibû. û wî bixwe bi serîhêjandinê, bi eynî girbûnê li binî wê wêr nivîsandibû: Revendo, tû têtî Şpa... Heft caran ev hatibû nivîsandin: Bi nivîsa min, bi Antiqua, Fraktur, Kursîv, Romî, Îtalî û nivîsa gilover; heftcaran zelal û bêmerhemet: Revendo, tu têtî Şpa ... Merivê agirkûjîyê niha bi ser ban-

ga pizîşk ya kêmbilind da xwe da aliyekî, wengina min nivîs bitûn didîf ya ku tozîkê xiş bûbû, ji ber ku min nivîs pir gir hebijartibû, pir bi benek bû.

Ez veciniqîyam, gava ku min pêvadanek di heta xwe ya çepê da hîs kiribû. Min dixwast ku xwe bispêrim, lêbelê min nikanibû: Min berve jêr li xwe nihêriya û aniha min ev didîf: Wan pêçana min vekiribûn, û çepilên min tunebûn û pîlê rastê jî tunebû û ez nişkeva li ser piştê ketim, ji ber ku tiştêkî ku min xwe pê bigirta tûnebû. Ez qirîyam; pizîşk û merivê agirkûj bi tîrsnakî li min nihêriyan, lêbelê pizîşk tenê mil di-kutandin û pê ra jî pêlê destîkê derzîyê dîna ya ku giran û bêdeng berbi dawîyê diçû. Min dixwast dîsa li texteyê binihêrim, lêbelê merivê agirkûj pir nêzik li hêla min dawestibû û rê li dîtina min girtibû. Wî qeyim bi milên min girtibû. û bîhna şevatê û qilêriyê ya ji unîformeya wî diha-te min û min tenê rûyê wî yê westîyayî û xemgîn didîf û min ew aniha nas kiribû: Ew Bîrgeler bû. „Şîr“, min bi dengêkî nizm got...

Çirîya pêşin (1950)
berdewamî heye...

STOCKHOLMÊ



Seyidxan Anter

Bi navên Brukselê û Mîtanî me di derbarê mijara kurdî de nivîsî bû. Vê carê dor hate Stockholmê. Ma ne ji xwe, her cîh û war xwedî dîrok, mecal, bûyer û taybetmendiyên xwe ne.



**Ji sala 1980î
û vir de, piştî
ku rêxistinên
kurd konê
xwe lê vegir-
tin û pê ve,
Stockholm
bû meydana
kar û xebata
kurdan.**

Li Swêdê, wek mihacirên (penaberên) ji neteweyên din, zarokên kurd jî heftê carekê dersê bi zimanê xwe dibînin. Ji xwendina zimanê makê (dê) re finlandîyan pêşengî kirine. Îro roj, xwendina zimanê zikmakî bûye mijarek xwezayî yê mafên mirovan. Di peymana navnetewî ya zarokan de ev maf zelal e. Her wiha, li gorî biryara YEyê ji kêmtewên mîna roman, laponî, cuhû û finlandîyan li bakurê Swêdê re, mafên perwerdeya giştî bi zimanê wan heye.

Bi qasî vî mafê me li jor got, helwest û tevgera kurdan jî rola xwe ya hêja li ber çavan e. Dîroka kurdan û xebata wan a bo zimanê kurdî li Swêdê, digêhîje dawîya salên 1960î. Rohat Alakom di lêkolîna xwe ya bi navê Têkiliyên hezar salî yên Kurd û Swêdîyan de, vê xalê fîne bîra me.

Mîna hûn agahdar in, heta sala 1980î, xebata politik, folklor û zimanê kurdî bêhtir li Uppsalayê dibû. Rêxistina Bahoz pirtûkên bi kurdî belav dikirin. Tîma xwe ya folklorê hebû. Navenda kovara Aso (organa komela





xwendevanên kurd li dervî welat) û fîma folklorê ya bi navê Çiyayê Sor li Uppsalayê bû.

Ji sala 1980î û vir de, pişî ku rêxistinên kurd konê xwe lê vegirtin û pê ve, Stockholm bû meydana kar û xebata kurdan. Ger em xebata polîtîk ya xas û teng kêlîkê deynin alîyekî, bi tenê kovara Çi bikin? li Uppsalayê derdiket. Kovarên Armanc, Berbang, Kurdistan, Kurdistan Pres, Nûdem, Vate, Roja Nû, Kufîk, Avaşîn, Veger, Tîrêj, Bîrnebûn û hwd... li Stockholmê derdiçûn. Keleha kovara Sîrwan jî li bajarê Gävle'yê bû. Li Stockholmê şanogerîya bi kurdî berhem da.

Stockholm di warê weşangerîyê de, APEC, Welat, Nûdem, Diljen, Pedagogiska Magasinet û bi dehan weşanxaneyên din, nemaze bi xêra wêjeya zarokan û kitêbên dersan li Swêdê, kurdî rewabûnek bi dest xistîye. Ji du mîlyonan zêdetir kurdên li Ewropayê hene, di nava wan de zimanê kurdî bêhtir li Swêdê bi kar û kêr hatîye. Li SR (rad-yoya swêdî), beşa kurdî karekî çê dike. Yek ji gavên pêşketî yê sala îsal jî, Världs Biblioteket (Kitepxaneya cîhanî) ya li bajarê Malmö ye. Helbet em nikarin Kitêpxaneya kurdî ya Stockholmê ji bîr bikin.

Stockholm û warên din yê Swêdê ji nivîskarên mîna Mehmed Uzun (Brodirêj), Hesenê Metê, helbestvanên wek Rojen Barnas, Fatma Savcî, Selva Gulî û belkî yê ji gişan behtir dilsofî Xîzan Şîlan, Kadir Çelîk û gelek nivîskarên din re, bûye war. Her wiha TVên kurdan wek mînak Medya, Roj, Newroz Tv, redaksiyonên xwe li Stockholmê bûne.

Di tevgera kurdî ya li Stockholmê de, Ala di destê kurdên Anatolîya Navîn de ye. Wekfa Kurdên Anatolîya Navîn, tenê bi xwendina dersên li dibistanê qayil nabin û rojên şemîyan jî zarok û me-




zinan re, fêrbûna kurdî ji xwe re kirine armanc. Kovara Bîrnebûnê bi înad e û serkefî dom dike. Di wêje û pirtûkên zarokan de berhemên Weşanxaneyê APECê, kêm zêde ketîye her mala kurdên xwedî li zimanê xwe dertên.

Bi ser van serkeftinan giştan de jî, çend mijar û pirsgrêkên em bi wan re rû bi rû dibin, hene.

- 1- Berîya 2016an li Västervikê, şaredariyê zarokên kurd dişandin dersên erebî an jî tirkî. Bi xebata hevkar ya şaredarî, mamostên zimanên din û yê kurdî, îro ev pirsgrêk çareser bûye.
2. Cardin li heman bajarî, dayîkek kurd, ji bo zarokên xwe neşîne kurdî hercar ev goşin dubare dikir: "Ma ne baş e ger zarok gelek zimanan fêr bibîn?" Bersiv jî hercar ev bû: "Rast e, zarok çi qas zimanan bizanibin hülqasî baş e, lê ne li ser hesabê zimanê makê (dê)." Zarokên vê malbatê îro diçin darsa kurdî.
3. Pirsgrêkek din yê li ber zimên jî, kesên bi kurdî dadikevin, wa xuya ye ne ji malê û dereng kurdî fêrbûne. Loma jî, ji pedagojî û metoden fêrkirina kurdî re xebatek berfireh û dolemend gerek e.
4. Ji bona şagirtî hemwateyên wek mînak; Tu çito yî? Tu çer dikî? Tu çawa yî? Çonî? Tu kutkî? Tu senîno? Di mijarên diyalekt û devokan de, pêwîstî bi perwerdekirina mamosteyên kurdî heye.

Ji berê ve li komele û rêxistinên kurdên Swêdê, ziman kurdî bû. Lê hin bûyer hene wateyê wan ji bo civak û pêşerojê xwedî





i protest mot shahen

Nå säger Habb, 30. Svenskarna förstår inte riktigt våra krav, när vi vill att Sverige ska agera mot Schahen. Habb har rätt. För det är en sådant enomskilt ämne att se dem komma vandrande.

I skärste, mjukaste blomsterblommor, de slängdes på vägarna i Uppland. De glänsar en viss när folket plöjde blommor när soldaterna invaderade ruller.

■ Reportage: VILHELM BENELL och HANS JAKOBSSON (foto)

nirxên giranbuha ne. Yek ji wan, gava sala 1985an krêşa bi kurdî li şaredariya Tensta vebû. Balyozê (konsolos) tirkan xwîn bi xwe ve dît. Lê bersiva berdevkê şaredariya Tensta Ove Rådberg, ya ku kêma zêde

"Kurdernas kamp i Irak kommer att fortsätta"

— Uppgifterna i pressen om att den kurdiska kampen i Irak uppgivits eller krossats är helt felaktiga. Det kurdiska folkets motstånd är fortfarande starkt. Vårt folk har kämpat i 10-års-tid för självständighet och politiska rättigheter och vi kommer att fortsätta kampen till döds.

Det sade Özalp Bekman, medlem i Kurdistan-studenterna i Sverige, vid ett möte på studenthuset i centrala Stockholm. Bekman uttryckte sin övertygelse att den kurdiska nationella kampen i Irak kommer att fortsätta till döds.

— Det är en viktig fråga för oss som kurdiska studenter i Sverige, sade Özalp Bekman. Vi är en del av den kurdiska kampen i Irak. Vi kommer att fortsätta att kämpa för självständighet och politiska rättigheter.



Fot. Habb. I Uppsala församla sig kurder för demonstrationer mot Schahen. I Uppsala församla sig kurder för demonstrationer mot Schahen. I Uppsala församla sig kurder för demonstrationer mot Schahen.

Sådan av Sovjet

— Den största orsaken till att den kurdiska kampen i Irak uppgivits är att den kurdiska kampen i Irak uppgivits.

Hälsningar

Välkomna till Kurdistan. Vi är en del av den kurdiska kampen i Irak. Vi kommer att fortsätta att kämpa för självständighet och politiska rättigheter.



digot, mîna her zarokan, mafê zarokên kurd jî heye bi zimanê xwe perwerdê bibînin, rê li ber êrîşên dewleta tirk girt. (Rojnâme-yên Dagens nyheter û Svenska dagbladet cîh dan vê bûyerê.) Ya din jî di salên dawî yên 1980î de, di civîna ERNK ya li David Bagaregatanê (navê xwe yê nu Olof Palme gatan) de, beşdarên civînê helwestek standin ku di civînan de bi kurdî bê qisekirin. Vê bûyerê Stockholm kir mîna Qamîşlo.

Wê demê, li Qamîşlo şerm û fedî bû gava kurd di malê xwe de bi erebî bipeyivîya û hîn jî wisa ye.

Gotinek swêdîyan heye, dibêjin;

Zarokên mirov ji wan hez dike, gelek navên wan hene. Ger me hin navên Stockholmê ji bîr kiribe, bila xwendevaran li me negirin. Xebatek dolementir û bi rêkûpêktir ya zimanê kurdî, di warê pedagojîk, metod û ferhengî de li kurdan tê. Her wiha nîfşên nû yên kurdan li Swêdê, têra xwe çalak û jêhafî ne. Xebatê vî nîfşê nû, ya di nav rêxistinên gelêrî yên sosyal û polîtîk de, dê avê li aşê tevgera zimanê kurdî bike.

Îca çi dikare rê li ber te bigire, tu di rûbarên kurdî de fêr avjenîyê bibî!





Berşu

Mehtab Îdelî

Piştî ku mirovan dest bi lixwekirina kincan kir, wê demê pêwîstiya şûştina kincan jî derket holê. Di destpêkê da kinc di nava çeman da dihatin şûştin. Çend kes kom dibûn û diçûn ber çeman. Siftê wan kinc şil dikirin, da ku nerm bibin, dûra bi lêdana kevîran û bi alikariya dest û lîngan dişûştin. Bi demê ra jî bo kincşûştinê gelek rêbaz derketin holê.

Em ê niha hinekî binêrin, ka mezinên me di dîrokê da kincên xwe çing şûştine.

Mirovên berê, di dema kal û pîrên me de, jî ber xizanî, tengî û tunebûnê, tenê xwediyê qatek

kinc bûn. Gava kereşîyan diçûn kincên xwe yên qilêr bişon, heta ku kincên wan zûha dibûn, telîs li xwe dipêçan û piştî zûhabûnê dîsa li xwe dikirin. Pê ra pê ra di nav demê da, piranîya mirovan kanîbûn jî xwe ra kincên şûnger bistînin. Ji wan kincan ra jî digotin "berşu".

Berşu, li herêma Anatoliya Navîn, jî bo kincên yêdek, yên ku li pey serşûştinê li xwe dikirin, tê bikaranîn.

Li hin herêman jî wekî "berşo" tê binavkirin. Li hin herêman jî berşu, jî bo kincên ku wê bîstî şûştinê, ango yên qilêr tê bikaranîn.

Berê, gava kesekî bixwesta serê xwe bişo û kincên xwe biguhere,



digot: "Ezî dujînî bûme, berşûya min hatiye, avê germ bikin, ez berşûyên xwe biguherim." Li havînan av li ber tavê dihate germkirin, an jî diçûn di nav çeman da serê xwe dişuştin. Li zivistanan jî biroş didan ser êr, bi ardû, pûş, ka, êzing, kerme û hwd. ar dadidan û av germ dikirin. Dûra testên mezin yên serşuştinê didan nava odan û yek bi yek serên xwe dişuştin û berşuyên xwe li xwe dikirin. Serşuştin him xweş bû him jî bi eziyat bû. Dema av pir germ an jî sar dibû, an jî dema sabûn biketa çavên yekî, bi qîrnîya wî ra ya kutak sabûn, an jî kutak merşev li ser serê wî diket. Zarokên ku ew rojana dîfî, bi piranî ew aqûbeta dîfine û ji nav avê tazî reviyane, da ku xelas bin, lê kesek jî xelas nedibûye. Car caran jî heger diya te hişmend be, gava diçûn li çolê kincan bişon, carakê jî serê meriva li wir dihat

şuştin. Hin kes ji dest difilifin, lê mixabin hin kesan jî ji tîrsa kutana xwe bi dest dixistin.

Yek jî roja şuyê hebû ku keçik û bûk bi hev ra diçûn. "Şu", bi roja kincên qilêr tîna şuştin ra tê gotin. Ew roja li gora pêwîstiyê dihat guhartin. Car car heftekî, an deh rojan carekê, car caran jî heger zarokên wan biçûk bin, sê-çar rojan carekê bû. Zivistanan li malê, li bihar û havînan li çolan dihate şuştin. Dema herin kincan, keçik û bûkan bi hev ra biroş bi benan girê didan û li ser piştê xwe bar dikirin. Dûra test, ardû û erzaqê xwarina xwe diavêtin û bi şahî diçûn ser bîr, kanî an jî çemên li çolê. Bi kincşuştina li ber çeman ra digotin "berav". Li çolê av di biroşan da didan ser êr. Av germ bû şûnda dikirin nav hewz an testan. Gil an jî sabûn derket şûnda sabûn dikirin nav avê, kinc



dikirin nav wê aravê. Dûra pêlê û toqaç dikirin. Yên spî diavêtin kelê, dikelandin, dûra jî li ava sar dixistin û diguvaştin. Dûra li ser gîhan an jî li ser stirîyan redixistin.

Redixistin, lê bêbexfiyê jî yek caran benda wan bernedida. Dema meta min ciwan bûye, bi hevaleka xwe ra çûye ser bîrê ku kincan bişo. Kerek li wan peyda bûye. Kerê ava wan ya ji bîrê bi êncartinê kişandinî vedixwariye û pêlê kincên wan raxistî dikiriye. Yek-du mêz kirine ku weng nabe, anîne îsoteka tûj kirine navbera nên û bi kerê dayine xwarin. Kerê xwariye şûnda, kiriye zirezir, vir da wê da beziyaye. Dûra li ser piştê ketiyê herdê û miriye. Kera xizan ji bo qultek av ji jiyana xwe bûye. Meta min car car qala vê meselê dike û dibêje: "Heger ez mirim eceba li dunya wî afî ew kera ê were û ji min hesab bipirse?"

Bêguman kes nizane, ku li wê derê çi wê were serê kê. Xwedê, mirov û heywanên candar ji aqûbetên veng biparêze.

Dûra bi pêşketina teknolojiyê ra her tişt hat guhartin, jiyana hêsanî bû, lê tehma berê jî nema. Mezinan digotin "Tew li zemanê me veng bû, niha her tişt î hazir e.

"Bixwe di odê da, birî di kodê da. Dema ku makîne derketin, her tişt sexte bû. Keçik jî, bûk jî, bûn yek bûkên naylon."

Zirav, zirav, ziravê
Leylo leylo ziravê
Kinc şûştin dane tavê
Ax zalim kafir bavê
Zirav çûye ber avê
Leylo leylo ziravê
Kinc şûştin dane tavê
Ax zalim kafir bavê



Çing: Çawa

Kereşî: Cilşo (kesê ku cilan dişo.)

Telîs: Tûr, çiwal.

Dujîn bûn: Gemar bûn.

Ar: Agir

Şu/şo: Ji roja kincên gemar tîn şûştin ra tîn gotin. Bi maneya hefte û bi maneya nobe/dor jî tîn bikaranîn. Ji bo kinchatina (ketina kincan) yan jî na keçxwînî jî tîn gotin.

Berav: Ji bo kincşûştina ku li ber çeman tîn gotin.

Arav: Ava bi gil, yan jî ava bi sabûn ya ku kinc di nav da tîn şûştinê; ava gemar.

Toqeç: Şonik

Weng: Wisa, wer.

Veng: Wiha, wilo.

Merşev: Simkot

Av êncartin: Ji ber ku li Anatolîya Navîn av pir kêr e. Wan tenê dikaribû ku avê ji bîran hêdî hêdî bikşînin û satilekê tijî bikin. Û kişandina avê bi vî awayî ra jî "av êncartin" dihat gotin.

Têbînî: Bi qasî ku min ji gotina xaltîya xwe fam kirî "av êncartin e", lê dibe ku "av êncartin" be jî.

Kurd: Nevîyên Nûh


Rohat Alakom

Destpêk

Pirtûkên pîroz ku wek Tewrat û Qûran dibêjin ku dema tofanê hezrefî Nûh bi keşîya xwe li serê çîyayên Agirîyê û Cûdîyê danîne. Ev herdu çîya jî îro li di nav sînorên Kurdistana Bakûr de dimînin. Ev yeka tê wê wateyê ku li rûbarê dinê bi mîlyonan mirov bi saya van pirtûkên pîroz zanin ku welatê Nûh îro li kîderê dimîne. Mijara tofanê, Nûh û keşîya wî ya ku li Kurdistanê derketiye sefereke xelasîyê di dîrokê de bala gelek kesan kişandiye. Ji ber vê ev mijar jî bo nivîskar û hunermendan bûye mijareke balkêş û rengîn. Peyva tofan di kurdî de peyveke naskirî ye, wek mînak dema yek ji yekî razî nîn be dibêje: "Kuro tu bûyî tofan!". Di gotinên pêşîyan de jî derbas dibe: "Ji agir xelas bûm, tofan ji min re hat" û "Cîhê baran tunebe tofan ranabe".¹ Keşîya Nûh ne tenê keşîyeke efsanevî û folklorîk e, vê keşîya efsûnkirî û pîroz îro gelek wezîfe, kar û fonksiyonên din wergirtiye ser xwe. Ev keşî bûye starekê ji bo aşîxwazan, dostê ajalan, qencî û pakîyê. Cara yekem dema ku min berî pênc salan lêkolînek di derbarê şopên Nûh û keşîya wî li Swêdê amade dikir ez rastî hin berhem,

¹ Heciyê Cindî, *Meselok û xeberekêd cmaeta kurd*, Êrêvan, 1985, rûp.44, 663.

mekan û dîtinên cihê hatim.² Li Stockholmê taxeke bi navê Medborgarplatsen heye ku min navê taxê danîye: Taxa Nûh. Li alîkî wê taxê peykerê Keşfiya Nûh, li alîyê din "Tengekuçeya Keşfiya Nûh" heye. Kurdan heta niha li dijî tofanên ku hatine serê wan li meydana vê taxê gelek civîn û meş çêkirine.



Rojnameyeke swêdî Cizîrê û Keşfiya Nûh û gora wî nîşan dide (Expressen, 21/4 1991)

Kurd berê xwe didin Cûdîyê

Hezrefî Nûh ne tenê ji alîyê misilman û kurdan de tê hez kirin, Nûh yek ji wan pêxemberan e ku îro li hemû cîhanê tê nasîn û hez kirin. Wek tê zanîn li gorî Quranê Keşfiya Nûh dema tofanê li serê çîyayê Cûdî daniye. Kurdan bawerîya xwe zêtir bi Quranê anîne, ev jî normal e. Di bîst û heş sureyên Quranê de navê Nûh derbas dibe, sûreya heftê û yekan bi temamî ji wî re hatiye veqetandin. Di tefsîra Quranê ya bi kurmancî de jî wiha hatiye nivîsîn: "Dengek li erd û ezmanan ket û got: Erd ava xwe daqûrfîne! Bibilîne. Ezman ava xwe bibilîne daqûrfîne; av kêr

² Rohat Alakom, *Dîroka Kurdistanê di çapemenîya swêdî de*, Apec, 2016, rûp. 213-235 (binêre beşa bi navê Li pey şopa Keşfiya Nûh li Swêdê).

bû êdî emrê Xwedê hate cîh. Heçî kafîr kirin fetisî bûn. Gemîya Nûh li ser Çîyayê Cûdî ko di Kurdistanê de ye-danî û dengek hat û got: Yên ko Xwedê înkâr kirine û kafîr bûne binêrin".³ Ji ber vê jî kurd bawer dikin ku ew nevîyên Nûh in. Rojnameke swêdî wêneyê du jinên kurd yên bi cilûbergen kevn wiha dide nasîn: "Kurd nêzîkî 3000 hezar sal e li serê çîyayên xwe yên asê- bi zehmet gehişbar- de jiyane. Li gor efsaneyê koka van xanimên zarîf ji Keşîya Nûh tê!"⁴

Efsaneyeke balkêş

Gerok Ewliya Çelebî ku di sedsala 17an de jiyaye di derbarê netewê kurd û zimanê kurdî dîtineke balkêş pêşkêş dike. Ewliya Çelebî di gernameya xwe de dibêje ku hezar salan berî bûyîna Îsa (4490) Keşîya Nûh⁵ li ser Çîyayê Cûdîyê daniye û li serê vî çîyayê bajarekî mezin çêkiriye, navê wî danîye Cûdî. Hukimdarê bajêr kesekî ji nijada Nûh bi navê "Kurdim Melîk" bûye. Qasî 600 salan jiyaye, zarokên wî li her deran belav bûne. Ji der zimanê îbranî zimanekî ku neşibandîye farisî û derî afirandine. Jê re gotine zimanê Kurdim. Ev yek tê wê wateyê ku zimanê kurdî ji nijada Hezrefî Nûh maye û zimanekî kevnare ye. Gorî Ewliya Çelebî wî ev agahî û zanyarî ji dîrokzanekî ermenî wergirtiye, navê wî jî dide Migdisî, wî wek çavkanî nîşan.⁶ Bi vî awayî ev gerokê osmanî balê dîkşîne koka kurdan, peydabûna wan û cudabûna zimanê wan. Dema em gotinên ku di Quranê de cîh girtine ligel van dîtinên Ewliya Çelebî bi tevayî didin ber çavan, wê demê giringîya Nûh û ew coxrafiya ku ji xwe re kiriye mekan ango herêma Cizîrê ji bo me dibe mijareke balkêş.⁷

³ Kamîran Alî Bedîrxan, *Tefsîra Qûranê*, Avesta, 2020, rûp.178.

⁴ *Expressen*, 21/4 1991.

⁵ Sefîne bi giştî ji keşîyan, gemîyan re hatiye gotin bi taybetî jî di îfadeya Sefîna Nûh de hatiye bikaranîn.

⁶ Martin van Bruinessen, Onyedinci yüzyılda Kürtler ve dilleri: Kürt lehçeleri üzerine Evliya Çelebi'nin notları, *Studia Kurdica*, nr 1-3 (1985, rûp.13-37.

⁷ Ayhan Tek, Cizîr wek Merkezeke Kanona Edeba Kurdî û Rengvedanên Wê ên di Şîira Kurdî de, *Şarkiat*, Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi, 2017, rûp.358-361.



Rojnameyeke swêdî ku dibêje li gorî efsaneyan ev "xanimên narîn" yên kurd ji koka Nûh tên (Expressen, 21/4 1991)

Kurd: Nevîyên Nûh

Derheqa eslê kurdan de zanayê kurd Mehmûdê Bazîdî sê dîtînan pêşkêş dike. Yek ji wan dîtîna sêwem koka kurdan bi malbata Nûh re girê dide. Piştî Tofanê kurê Nûh, Yafet (Yafes) dema li cîhanê digere, keçeke sêhîrbaz dîtiye û bi wê re zewiciye. Zarokên wan çêdibin û ew li her derê belav dibin. Kurd bi vî tehrî berî dîrokê peyda dibin. Mehmûdê Bazîdî vê çîrokê zêdetir nêzikî rastîyê dibîne.⁸ Kurdan ji berê de bawer kirine ku ew ji ometa Nûh tên. Wek mînak em di nivîseke li ser kurdan de dibînin ku wan koka xwe heta Nûh birine: "Eşîrên kurd ji bo ku ji nijada Nûh Pêxember tên gelek şanaz dibin". Ev nivîsa dirêj ku di sala 1854an de di rojnameya bi navê Kavkaz de hatiye weşandin gelek agahî û zanyarîyan di derbarê kurdan de pêşkêş dike. Ev nivîsa li ser kurdan bê îmze ye.⁹ Yek ji wan zana û nivîskarên kurd ku cara pêşîn bala xwendekaran kişandiye ser vê mijarê helbestvan Evdîrehîm Rehmî Hekarî (1890-1958) ye. Ew di berhema xwe ya bi navê "Perek Zêrîn Ji Tarîxê" de bi manzûm dîroka kurdî bi zimanekî sade

⁸ Almanaxa Kurdî, Weşanên Roja Nû, 1997, rûp.77.

⁹ İsmet Konak, Kavkaz Gazetesinde Kürtler (1854), *Kürt Tarihi*, nr 43/2021.

dide nasîn. Li gorî lêkoler Ayhan Geverî, helbestvan Evdirehîm Rehmî Hekarî li vir: *"Hezrefî Nûh wekî Melikê Kurd daye nasîn û welatê Kurdistan ji wekî navenda tewhîdê/dînên îlahî bi nav kiriye"*.¹⁰ Çawa em dibînin nivîskarekî kurd ev dîtînen nivîskarê osmanî Ewliya Çelebî pêşta biriye, li mijara Nûh xweyî derketiye. Nivîseke din jî heye ku ji alîyê Emîn Feyzî (1862-1929) de hatiye amadekirin: *"Kurd ji kîjan unsurî ne?"*. Mihemed Emîn Feyzî di vê nivîsê de koka kurdan digihîne heta heyama Hezrefî Nûh. Ew dibêje Keşfiya Nûh li Kurdistanê li serê Çîyayê Cûdî danîye, ewledê Nûh li Kurdistanê cîwar dibin, paşê li hev zêde dibin û li her deran belav dibin. Mihemed Emîn Feyzî kurdan ji nû ve dide nasîn: *"Kurdên Ewladên Nûh"*.¹¹



Wêneyekî kevn ku nişan dide serê çîyayê Cûdî çawa bûye zîyaret

Serê Cûdîyê dibe zîyaret

Ji ber van sedeman kurdan ev gotinên Quranê û kesên wek Ewliya Çelebî giring dîtin, hêdî hêdî bawerîya xwe bi Nûh anîne, ew wek kesayetîkî pîroz pejirandine. Di dawîyê de wan bawer kiriye ku ew ji nijada Nûh tî. Tenê gotin û efsaneya tîra vê bawerîyê nekiriye. Kurdan ev çanda etnogenesisê

¹⁰ Ayhan Geverî, Evdirehîm Rehmî Hekarî û Berhema Wî Ya Li Ser Tarîxa Kurdistan: Perek Zêrîn Ji Tarîxê, *Wêje û Rexne*, nr 5/2015, rûp.15.

¹¹ Emin Feyzi, *Kürdler Hangi Unsurlandılar? Kurdistan*, nr 19, 29 Mart 1920.

(pêkhatina komeke etnîkî) bi zîyaret, mizgeft û berî her tişî jî wan gora Hezrefî Nûh li orta Cizîrê kolandine û ew li wir veşartine. Dane ser seran, ser çavan! Ne tenê ev çavkanîyên dîrokî herweha çavkanîyên dînî, faktorên coxrafîk, şahî û pîrozbahîyên kurdan yên kevin jî bawerîya kurdbûna bo Nûh di nav gel de xurt kiriye, pêşta biriye. Wek tê zanîn li gorî Quranê, Keşfiya Nûh li ser çîyayê Cûdîyê daniye.¹² Serê çîyayê Cûdîyê paşê ji aliyê kurdên li vê herêmê de bûye zîyaretekê, cîhekî pîroz. Kurdan serê çîyayê Cûdîyê bi dedsalan wek cîhekî pîroz hesibandine û nixrandine. Ew hersal havînan çûne ev zîyaret pîroz kirine ji bo ji qeza û belayan xelas bibin. Vê yekê bala biyaninyan jî kişandiye, wan jî wek kurdan berê xwe dane vî çîyayê pîroz. Yek ji wan nûçeyên pêşîn ku di sala 1909an di rojnameya swêdî Aftonbladetê de hatiye weşandin dibêje ku kurd vir wek zîyaret dihesibînin û havînê di meha tebaxê de diçin li wir dua dikin.¹³ Gerok, arkeolog û şefa muzeyê ya îngîlîz Gertrude Bell dema di sala 1909an de diçe hêla Cizîrê, derdikeve serê çîyayê Cûdîyê.¹⁴ Li gorî kesekî jî Cizîrê kesên ku her heft inê çûne ev der pîroz kirine xwe wek hecî hesibandine yan jî hatine hesibîn. Kurdên herêmê gelek qedrê Nûh digrin.¹⁵



Gora Nûh û Camîya Nûh li bajarê Cizîrê (Wêne: Tofan Sunbul)

¹² Di Quranê de di qasî 28 cîhan de di derbarê Nûh de agahî tê dayîn û di 43 cîhan de navê wî tê dayîn û sureya 71an bi navê wî ye.

¹³ Noacks berg, *Aftonbladet*, 18/12 1909.

¹⁴ Gertrude Bell, *Amurath to Amurath*, 1911.

¹⁵ Nivîskarê kurd Arif Zêrevan, di hesabê xwe yê twitterê de diyar dike ku ew ji bo bavê xwe tîrbekê çêdikin ku berê xwe daye "Çîyayê Cûdî û mekanê sefîneya Nebî Nûh" Ev mînak nîşan didin ku şênîyên herêmê hezrefî Nûh wek kesayefîyekî pîroz dibînin: "Berî yazde mehan (17/10 2020) babê min, alimê welatê Botan, seyda Şêx Mele Evdirehmanê Gundikî wefat kir. Li Gundikê Mefî, li goristana Temtemogê, li serê girekî li hemberî Çîyayê Cûdî û mekanê sefîneya Nebî Nûh turbeya wî ava dibe. Hêvî dikim ko heta mehekê temam bibe. Rehma Xwedê lê be!" (17/9 2021 @ArifZerevan).

Bajarê Cizîrî û Şîrnexê: Bajarên Nûh

Li herêma Cizîrê kurdan ji Hezrefî Nûh re hembêz vekirine, bedena wî li vir veşartine, wek tê zanîn gora Nûh îro li Cizîrê ye. Hersal bi hezaran kes diçin ser gora wî hurmeta xwe nîşan didin. Ew mezinahîya gora wî bi awayekî mezinahîya hurmeta şênîyên herêmê jî nîşan dide. Li Cizîrê mizgeftê jî heye ku navê Nûh lê kirine: Mizgefta Nûh. Kurdên herêmê bajarê Cizîrê mîna "Bajarê Nûh" dihesibînin. Kurdên vê herêmê dîroka xwe ya dînî gîhandine dîroka xwe ya çanda netewî û sîyasî jî. Wek tê zanîn lehengên destana kurd ya neteweyî Mem û Zîn jî ji vî bajarî ne. Beşeke bûyerên destanê jî heman bajarî derbas dibin. Di nav gotinên pêşîyan de ku Prof. Heciyê Cindî weşandine, ez rastî vê gotinê hatim "Cizîra Bota-sebra xorta"¹⁶ Vê gotina pêşîyan gelek bala min kişand. Tawilê ew beşên evîni yên destana Memê Alan û berhema Mem û Zîn ya Ehmedê Xanî hate bîra min. Mîrên herêmê bi sedsalan jî xwe re li vir textek ava kirine. Di dawiyê de serî hildane, ev tevgera bi Serhildana Mîr Bedirxan navdar bûye. Malbata Bedirxanîyan di dîroka Kurdistanê de roleke mezin lîstîye.

Çawa tê zanîn Cizîre bi fermî Şîrnex re girêdayî ye. Peyva Şîrnexê jî bala zimanzan û lêkoleran kişandiye. Şîrnex jî berê de wek bajarê Nûh (Şehr-i Nuh) tênasîn. Peyva -nax ku paşpirtika navê Şîrnaxê pêk fîne di zimanê ermenî de tê wateya keşfî û dişebe peyva Nûh jî. Navê gundekî Şîrnexê Yafes (Kasardela) e û navê kurekî Nûh jî Yafes e, vê rasthatinê û hevşibandinê bala lêkoler Bîlal Aksoy jî kişandiye e.¹⁷ Di vî warî de lêkolîn her berdewam in. Piştî salan bi navê Hezrefî Nûh û Çîyayê Cûdî sempozyumeke berfireh ji aliyê Unîversîteya Şîrnaxê de hatiye amadekirin.¹⁸

Nûh di edebîyata kurdî de

Him di edebîyata kurdî ya klasîk de him jî ya nûjen de em rastî mijara Nûh û keşfîya wî tînin. Yek ji wan helbestvanên kurd ku cara yekem mijara Nûh anîye zimên Melayê Cizîrî ye. Nûh tê gotin ku qasî 950 salan jiyaye. Ev temendirêjîya Nûh bala helbestvanên kurd jî kişandiye. Wek mînak helbestvanê navdar Melayê Cizîrî di helbesteke xwe de de wiha dibêje:

¹⁶ Heciyê Cindî, *Meselok û xeberokêd cmaeta kurda*, Êrêvan, 1985, rûp. 663

¹⁷ Bîlal Aksoy, *Nuh'un Gemisi ve Tufan*, İnsanlık Yolu Yayınları, 1987, rûp.229.

¹⁸ *Uluslararası Hz. Nuh ve Cudi Dağı Sempozyumu Bildirileri*, ed. H. Gündoğar... Şîrnax Üniversitesi Yayınları, 2014.

Tali' ku bêl û furset, muhlet li nik heram e
Min umrê Nûh-i nîne, saqî were, bilez xweş

Yek ji wan helbestvanên kurd ku cara yekem mijara Keşfîya Nûh û Çîyayê Cûdî di berhemên xwe de bi kar anîne, Ehmedê Xanî ye. Helbestvanê navdar, di beşa 23an ya destana Mem û Zîn de dema qala "Bûktîya Sîfîyê Jibo Tacdîn" dike ew li wir navên Keşfîya Nûh û Çîyayê Cûdî jî dide, bi zimanê îro:

*Paşê ji nîşka ve derê qencîyê vebû li ser
Çîyayê Cûdî, li gemîya Nûh Pêxember*

*Yanî ew koşka ku Sîfî tê de bû
Ew koşka ku ew perîya bi rastî tê de bû.*¹⁹

Nivîskar û lêkolerê kurd M. Emîn Bozarslan di derbarê van rêzan de wiha dibêje: "Xanî li vir, ew boşayîya (qelebalix) mirovan şibandiye deryaya dema tofana Nûh Pêxember, koşka Sîfî tê de ye bûye, ew jî şibandiye gemîya Nûh Pêxember ku piştî xilasîya tofanê û daketina avê, li serê Çîyayê Cûdî sekiniye û kesên tê de jê derketine û dest bi jiyanê nû kirine. Wek tê zanîn. Di Quranê de cî girtiye ku gemîya Nûh Pêxember li serê Çîyayê Cûdî westaye. Nivîskar û hozanê kurd Evdîrehîm Rehmî, dema qala vê bûyerê kiriye, daye zanîn ku "Cûdî" jî bi kurdî ye û eslê wî yan "cî de" yan jî "çû dî" ye; paşê jî nivîsîye ku li binîya Çîyayê Cûdî gundek heye, navî wî "Çil-mal" e, kesên ku li gemîya Nûh siwar bûne û jî tofanê xelas bûne, ew jî çil mal bûne û wan ew gund ava kiriye (Evdîrehîm Rehmî, *Gazîya Welat, rûpel 1-2, nusxeya destnivîsar*".²⁰

Xanî li vir wan mirovên ku çî jin çî mêr ku xwe xemilandine, bi coş û kelecana derketine derve wek behreke ademî dibîne û rabûna pêlên gur yên vê behrê jî dişibîne wek tofana dewra Nûh. Koşka Sîfîyê jî wek Keşfîya Nûh dide nasîn. Tiştêkî balkêş li şuna peyvên gemî û sefîne Ehmedê Xanî di zimanê orjînal de peyva keşfî bi kar fîne. Yek ji helbestvanên ku mijara Nûh di berhemên xwe de bi kar anîye jî Evdîrehîm Rehmî Hekarî ye:

¹⁹ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, wergerê fîpên latînî û kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, 1995, rûp.341.

²⁰ Heman çavkanî, rûp.341.

Ji nesla Hezrefî Nuh im ku navê wî Melîk Kurd e
Ji wî ev nav mabû milletê min, lew dibên Kurd e

Esasê dînê Tewhîdê ji bo me xelq kirî Ellah
Ji me rabûn temamê enbiyan hem Resulellah

Di tarîxa muqeddes da muheqeq rabûye Tufan
Nesara û Yehud û Musluman pêkve dîkin îman

Sefîna Hezrefî Nuhî ku westaye li ser Cudî
Bi nesa ayetê ev sabit e Cîdî we ya Çudî²¹

Di edebîyata kurdî (bi zaravayê kurmancî) de qasî ku ez zanim mijara Nûh û keşîya wî zêde nehatiye bikaranîn. Hesenê Metê di romana xwe ya bi navê Tofan de xwendevanan dibe coxrafya ku li gorî pirtûkên pîroz Nûh bi keşîya xwe lê daniye. Peyva tofan di edebîyata kurdî de bi weşandina romana Hesenê Metê ya bi navê Tofan zêdetir hate nas kirin û belav bû. Di cîhekî romanê de em van peyvan dixwînin: *"Ev erd jî weke hertişfî, erdê rebê alemê, cîh û warê zarokên Nûh e. Ev der Cîzîra Botan e, erdekî miqades e..."*²² Di romanê de qala Tofana duwem jî tê kirin.²³ Sîdîqî Hîroî di romaneke xwe de keç û xortan dibe serê Çîyayê Cûdî, dema vegeêrê dibe şahîyeke mezin, gera wan bi evîn û xweşî derbas dibe.²⁴

Carina tenê ev mijara beşeke piçûk yê hin behreman pêk fîne. Wek mînak nivîskarê kurd Fawaz Husen di romaneke xwe de ya bi navê *Heftîyeke Dirêj li Amedê* de xwendevanên xwe carina dibe berpalên çîyayê Cûdîyê. Mekan jî gundekî bi navê "Gundikê Melî" ye ku bi bajarê Şîrxê re girêdayî ye. Ev gunda li ber pêyên Çîyayê Cûdî ye ku keşîya (sefîne) hezrefî Nûh berî hezaran sal lê daniye. Xwedayê mezin li xiraban hatiye Tofanê, qira wan hemûyan anîye bona ji nîşeyên nû re cîhaneke paqij û delal bihêle. Di romanê de navê Nûh du caran derbas dibe. Lehenga jinî ya romanê Besna di sala 1971an de li vî gundî hatiye dinê, dema mezin bûye, ew dane Fermanê Mala

²¹ Ayhan Gevefî, *Evdîrehîm Rehmî Hekarî û Berhema Wî Ya Li Ser Tarîxa Kurdistan: Perek Zêrîn Ji Tarîxê, Wêje û Rexne*, nr 5/2015, rûp.13.

²² Hesenê Metê, *Tofan*, Weşanxana Apec, 2000, rûp.32.

²³ Hesenê Metê, *Tofan*, rûp.47.

²⁴ Sîdîqî Hîroî, *Ez û Delal*, Weşanxana Ava, 2013, rûp.9-15.

Evdê. Besnayê gelek caran ji kurê xwe Mîrza re gotiye ku salên jiyana wê yên herî xweş li kêleka çiyayê Cûdî derbas bûne.²⁵

Di hin helbestên kurdî yên nûjen de jî em rastî temaya Nûh û keşfiya wî tên. Şêrko Bêkes wek mînak di helbesteke xwe de wek Melayê Cizîrî bala xwendevanan dikşîne ser temendirêjîya Nûh. Şêrko Bêkes temenê perperîkan û Nûh dide ber hev, wek tê zanîn temenê perperîkan tenê rojek e:

Perperîk

Xeman mexwe... perperîkê

Temenê te pir korte, lê... xeman mexwe

Ew jiyana ku tu,

di vê kurtedemê de didî helbestan,


emrê Nûh nedaye wan.

Mueyed Teyîb jî di helbesteke xwe ya bi navê Gemî û Kevir de ku dîyarî hevalê xwe nivîskar Hesênê Metê kiriye, qala Nûh û keşfiya (gemî) wî dike.

Ey Xwedayê mezin

Te tofan rakir, gemî ji bo çi bû?

Te Nûh xilas kir, nîşê wî ji bo çi bû?



Rojnameke swêdî dinivîse ku serê çiyayê Cûdî bûye zîyaret
(Aftonbladet, 18/12 1909)

²⁵ Fawaz Husên, *Heftiyêke Dirêj li Amedê*, Avesta, 2015, rûp.127-134.

Cizîr û Agirî

Çawa tê zanîn gorî Quranê Keşîya Nûh li serê çîyayê Cûdîyê, gorî Tewratê jî li serê çîyayê Agirîyê (Ararat) daniye. Herdu herêm jî mekanên kurdan yên bi hezaran sal tîrî hesibîn, kurdan ev cîhan jî xwe re kirine star. Ev herêm jî du cîhên coxrafîk zêtir wek cîhine pîroz tîrî nasîn û nîrxandin. Ji alîyê çand û folklorê kurdî de ev herdu herêm derdikevin pêşberî me. Dîroka destana kurdî ya neteweyî Mem û Zîn jî heta van herdu herêman dirêj dibe.

Li Cizîrê ku çîyayê Cûdî lê dimîne, lehengên vê destanê Mem û Zînên bengîn hatine veşartin, gora nivîskarê vê destanê Ehmedê Xanî jî li herêma Agirîyê li bajarê Bazîdê ye û bûye zîyaretekê. Bajarên Cîzre û Bazîdê wek du bajarên destbira dikarin bîrî hesibîn. Belê xeta di navbera Cîzre û Bazîdê de jî alîyê dîroka çanda kurdî de xetere rengîn û birîqî pêk tîne. Eger em bi nêrînek çapraz û pîralî vê mijarê analîz bikim gelek xalên hewaskar û balkêş dikarin derdikevin pêşîya me. Ronî Nasirkaya jî navê serhatîke xwe daniye: *Tîbûna Nûh*. Nivîskar me dibe herêma Agirîyê. Ji malbatekê re kurek çêdibe, navê Hezretî Nûh lê dikin, navê wî dibe Nûh. Bavê wî vî navî bi zanefî li kurê xwe dike: “Eger em rojekê têkevin tengasîyê, belkî ew jî fena Nûh Pêxember me xelas bike derxe serê çîyayê Agirîyê”.²⁶ Carina em di hin helbestan de jî rastî mijara Nûh û Agirîyê tîrî. Berî çil salî min helbestekî kurdî xwendibû ku qala mijara Nûh û Tofana li herêma Agirîyê dikir. Helbestekî gelek balkêş bû, ji alîyê Adî Rojkanî de hatibû nivîsîn. Piştî salan wî jî min re got ku: “Ew helbestê min yê pêşîn û dawî bû”. Di beşekê de wiha tê gotin:

Ararat

...

Paşê li me rabû tofan.

Nuh vebû hat bû mêvan.

Me qedir girt, da ser seran û ser çavan...

Sal-sala bihûnî, roj-roja bihûnî.

Dewran li me zivîrî,

Ortê hildan mêtî, camêtî

*Hineke rê hineka av li me dibirî.*²⁷

²⁶ Ronî Nasirkaya, *Seccade, Weşanên Sîlav*, 2020, rûp.121-132.

²⁷ Adî Rojkanî, *Ararat, Dengê Komkar*, nr 36/1981.



Karîkatûrekî alman ku Keşîya Nûh û Serhildana Agirîyê bi tevayî nîşan dide

Nûh tê hawarîya kurdan

Heta berî çend salan jî min gelek meraq dikir gelo nivîskar, hunermend yan jî zaneyek heye ku Serhildana Agirîyê (1930) û Serpêhatîya Tofana Nûh ku li gorî Tewratê li heman herêmê pêk hatiye bi tevayî aniye ber çavan û tiştek afirandiye? Di dawîyê de karîkatûrekî alman ku di sala 1930yî çêbûyî min dît, lê min bi çavên bawer nekir, wisa watedar bû. Dema Serhildana Agirîyê germ bûye di rojnameya almanî ya hîcîwî de karîkatûrekî gelek balkêş tê weşandin (Kladderadatsch, nr 35/1930). Keşîya Nûh ku dema Tofanê li serê vî çîyayî danîbû hatiye hawara kurdên îsyankar. Nûh kevokê jî firandiye alîyê Agirîyê herêma ku Serhildana Agirîyê lê çêbûye ji bo ka bi-zanibe rewşa kurdan çi ye? Kesê ku ligel ajalan serê xwe dirêj kiriye sîyasetmedarê fransî Aristide Briand e ku Xelata

Nobelê ya Aşîfîyê wergirtiye (1926) û di salên 1930 yî de di nav "Cemîyeta Neteweyan" (Völkerbund) de aktîv bûye. Li jêra karikatûr de kevoka aşîfîyê berbi hêla Serhildana Agirîyê difire û bi almanî em li wir peyvên "Kurden Aufstand" (Serhildana Kurdan) dixwînin.²⁸

Encam

Çawa li jor jî tê dîtin peyveke wiha piçûk ku ji sê tîpan pêk hatiye: *Nûh* rol û fonksiyoneke çawa mezin li cîhanê listiye/dilîze. Herwiha bûye mîrateyeke çandî. Dema mirov ketine tengasîyê, tengazar, belangaz û perişan bûne cara pêşîn Nûh hatiye bîra wan. Projeyên xwe bi vî navî dane nasîn.²⁹ Keşfîyên Nûh îro li hemû cîhanê ji belengaz, bêçare û bêgav, nexweş û hemû kesên di bin tîrseke û xofeke mezin de ne ji gişkan re dergehên xwe vekirine. Van keşfîyan îro li rûbarê dinê filoyeke mezin pêk anîye. Çalakîyên dilrehmîyê û xêrxwazîyê yên vê filoyê her diçîn zêde dibin.

Pêştaborina stratejîyên ji mirin û tunebûnê xelasbûn her-tim çêkirina keşfîyên teze yên Nûh anîne rojevê. Kevokên ku ji Keşfîya Nûh hatine firandin îro bûne nîşana tevgerên aşîfîyê. Keşfîya Nûh wek serpêhatîyeke dînî, mîtolojîk û dîrokî, herweha di derbarê xweykirin û parasina cîhana ajalan de bûye nîşaneke bibîxistin û hişyariyê, roleke pratîk dilîze.³⁰ Îro wek tê zanîn koka gelek ajalan kêr dibe û hinek ji wan êdî winda dibin. Tiştên ku îro em dikarin ji serpêhatîya Keşfîya Nûh û tofanê fêr bibin bi rastî gelek in. Bi navê Nûh mijarên mirovahîyê, pîrsgirêkên gelên wek kurdan bindest û bêçare dikarin bên nasandin, nîqaş kirin û çareserkin. Dema Xwedê mêze kiriye li rûbarê dinê nepakîyê serî hildaye, sînor nas nake ligel Nûh bi hevkarîyeke mezin yekîtiyek pêk aniye. Bi bawerîya min eger kurd li mijara Nûh tam xweyî derkevin, qezenc û hatinîya wan wê pir be. Eger nivîskar, hunermendên wek muzîsyen, nîgarkêş, peykarsaz bi mijara Nûh û Tofanê mijûl bibin gelek dergehên nû dikarin li pêşîya wan vebin. Xwedê îmkaneke mezin daye kurdan, lê belê em nikarin vê îmkanê bi zaneî û bi evîneke mezin bi kar bînin.

²⁸ Rohat Alakom, Bir Alman Karikatüründe Ağrı Ayaklanması'nı Farklı Okumak, *Kürt Tarihi*, nr 25/2016, rûp.4-7.

²⁹ Befrielseologin är inte död, *Svenska Dagbladet*, 17/12 2001.

³⁰ Stor internationell insamling för hotade vilda djur, *Svenska Dagbladet*, 29/9 1961.

Qerfo

Sfîleke nu ye. Bêhed, bêsansur û otosansur e. Rexne û henek in.
Bêtirs in, lê zik û hîsên kesî naêşînin. Çav û mêjo vekirî ye.

Qeder î
çewt hatiye nivîsandin
berxwedan

rojî germ
darî bîyê serin dike
asumanê hêşîn

berçavkên
reş û sipî
xwedanê qeregûn

cedwelê ser masê
êşên nênikên min
bibîranîn

piranîya insanan
li sayê digere
mala minê

dema ku ez covkî
di dest yekî bi krawat da dibinîm
destên min î diwerimin

cemberê dilî min
ne serî ye ne jî binî
doralî

li ber malê paqijvan
erebe bermayî
xweşbîr

Quto

Roj î dibiriqe
sihên dirêj dibine
pelên diweşîne

mêwê darê
mizgînîya bin erdê na
bawerî

jin î dixwaze
keça xwe ast bike
law jî bavê bilindtir

ronahîya rojê
kozîyên pêlan
kerîyên koçber

tarîyî bi lez e
stêrk î bi şewq in
hîv dereng ma

darên ber malî min
her roj bi rengên cuda
wêneyan çêdikine

kokên darê
di bin erdê da
mewê xwe li ber roj

Seyfî Doğan

Helbest



şeveke havîn î tarî
stêrk ronî
min agirekî xwe dada
li kevîyê cemî zelaî
min dest û pîyên xwe şûştin
bî pefiyên wî agirî
xwe da ser kursiyê li kêlekê masê ji darê bî hatîye avakirî
li ser masê tizbîya ji dendikên zêytûnan
haoma û qedexê sipî
em hemî ji hevdu re bûn
yar
derman
û mêze
me suhbet kir heta ku em bûnî kozî
*Haoma(homa) Di mîtolojîya arîyan da Xwedayê bereketê
*Vexwerina ku însanan mest dike
*Vexwerina ku însanan ji xwe derbas dike
*Vexwerina ku xelkê zîncîrên rojane fireh dike



bi piranî jî qalê payîz î zer
payîz î bi bereket û payîz î daweten
biharê ji bîr meke bi teybetî jî meha gulanê
demî gehêşîye û ducanîyê
min wê salê ji bayî biharê pir hez kir pir
bayî berbangê porê reş li ber min pêl û pêl herikand
min wê salê ji wî bayî biharê pir hez kir pir
wek şaîrekî hosta evîna min xemiland
qalê hêkatên ku min ciwan dîkin bike
kalbûnî zatî ê li derî min e
qalê asumanî hêşînî ku bi ewrên sipî xemilandî bike
li nav kolan û kocan li ser kanîyan û kevîyê cemên
li çîya û banîya li şopên min bigere
dibe ku bayî malê neyaran şopên min tijî ax kiribe
qalê gund bike ne kêr ne jî zêde
bawulan ez westandime barî dilî min sivik bibe
bi zimanî min deng ke ku
ma tamên xweşê ku wanan li ser zimanî min rişandî werin bîrê min

Seyfî Doğan

Henek

Ferîdun

Ramo û Hesê li ber dikanê Memî Malê Ûtê rûniştine.

Li kêlekê vanan jî çend xortên ketine minaqeşeke sîyasî yê kûr.

Ramo û Hes jî guh didine ser wanan.

Ji ciwanan henê politika Sovyêtê hen ji wanan jî politika Çînê dipesînine.

Xortên gelek angajên û çosdar in. Te yê bigota yê rabine ser lingan

û bibine siwarên hespên çê û dinê azad bikine!...

Ramo û Hesê jî xwe re kal û kal guh didine ser wanan.

Yên ku Çînê mêth dîkin î pir bi deng in.

Ramo jî teva minaqeşe dibe;

"Politika Çînê zordarî ye. Bi însanan îşkence dîkin.

Îşkencên Çînê bi nav, xof û bi deng in.

Ji mirinîyê re li însanan têxin. Ji wêre û wêre yê ku lê têxin zewqê hildin û mest dibin"!

Hes î bi dizkî, di guhê yekî Maoci da dibê,

" Ramo, pez berda zevîyê teteran û bekçî teteran jî lêxist û ji hingê pêda î ji yê çavzirav hez neke"

Bihar e û nîvro ye

Ramo û Hesê î xwe li teltekî dane berroj.

Her yekî heybekî di dest da ye û î bêdeng rûniştine.

Di ber wanan re keçek derbas bû.

Ramo nas nekir û ji Hesê birsî; Ew kî bû?

Hesê: Ew keça Bilalî Maco yê ku li Engurîyê hiquqê dixwîne.

Ramo: Eferin! Bilêl him lawik û him jî keçek bi xwandî dan.

Hes çaxî Ramo bû: Ramo! Te nexwend lê tu dîsa jî zana yî.

Tu tim di nav telebê zanîngehan da yî, tu bi wanan re radibî û rûdinî tu ê bizanî!

Ramo: Magî, qirfê meke !

Hesê: Demokrasî çi yê?

Hesî mino! Demokrasî! Pîramîd e!

Hes: Çing Pîramîd e?

Ramo: Barî yê li jor, li ser milên yê li jêr in.

Hes: Pekî komunîzm çi ye?

Ramo: Komunîzm sifra cenberî ye.

Odeyên gundan

Hızır Akbina

Demên berê li gundan ode hebûn. Ew odeyana jî, ya gundiyan bi hevûdu re çêdikirin yan jî yekî dewlemend: axayê gund, mezinekî eşîrê odeya xwe vedikir û gundî li ba wî dicivîn. Şevên zivistanê yên dirêj li vir derbas dikirin.

Ew odeyana mektebên gundî-yan bûn. Li wir, dîrok û edetên eşîran, dayîn û standina kesan, jiyana rojane, pirsên mal û malbatan, agahdarî ji bo heywan, zîreet, bax û baxçe, çol û banîyan li vir diavêsin. Mezin û çûkbûyîn li meydana odeya dihat hevisîn. Şorên xweş, şorên bi qîmet li vir dibîstin. Carcaran kesên xwendina xwe hêvî ji cimaatê re ji pirtûkan jiyana pêxemberan, qehremanîya Hz. Alî ya li şer, evîndarîya Mem û Zînê, Ferhat û Şêrîn, Kerem û Aslı dixwend û cimaat pê digirîya. Carcaran ji welatê jêr dengbêjek dihat li odeya gund dibû mêvan. Cimaatê heta azana sibehê guh dida ser kilamên dengbêj.

Ji hevdu mamik (bîlmece) pirs dikirin carcaran.

- Sinîya qilê kirî, paş heft çiya de hêlkirî.

- Hilintir milintir, law ji bavê bilintir.

Ji hev malên li gund dipirsin, kesekî digot: Maleka min tê, tê ji quncî alî ferêt/felat de sê mêr û çar jin hene, bizanin mala kê ye? Bersiva vê pirsê heta dihat zanîn berdewam dikir. Armanç di vir de ew bû ku kesên li gund hatin dunê an jî hene bizanîne. Nifûsa malbatê û gund derdikeş holê. Kurikên nû hatine dunê re jî xebera wan dibû.

Ji cimaatê kesekî hesaw pirs dikirin. Ji bo gotinên xwe şîrîn bike, dest bi çarînan dikir, wek mînak digot:

*Cotik hespî sor û kumêt
Li ba xûdanê xwe yî bi qîmet
Wanîn ba nalbend nal kin
Pê zevî û zîyanên xwe rakin*

*Nalbend got ez nal nakim
Wunê siftê hesabî min bikin
Bêje hesabê te çi ye
Hespê me yî birçî ye.*

Wê cimaatê bê pênuş, bê defter ew hesaw di mejîyên xwe de hesap dikirin. Yên bersiva xwe hazir kirin ji kesê pirskirî re di guhê wî da dipistikan. Yên hesaw rast didan, cimaatê ew xelat dikirin. Digotin:

Xelata me ya hîro: Şêkî serîya, kêreka berîya.

Bavê min rehmetî digot: Tahmek me ji odeya gund heyneyî em î hîro ji teknolojiyê heynaninî. Ew odeyana rabûn û rûniştin bi me hevisand.

Li dawîyê pirs min ji we xwendevan re (Ev pirs jî yek ji pirsên odeyan bû):

*Ew panzdeh-Ew panzdeh
Du bîstik du şanzdeh
Caran cot hespê min hene
Nal û mîxê wan çi dikin?*

Kesên daxwaz dikin, li ser maîla jêr ma bersiva xwe bişînin. Ez ê lê mêze kim. Du xwendevanên ku bersiva xwe zû bidin, ew ê ji min wek xelat pirtûkekê bigirine. Ez ê li dawîyê bi wan re têkevîm têkiliyê.

Xelat: 1. **Şîyarên Deşta Anatolîyê**

Muzaffer Özgür (Roman)

Xelat: 2. **Pejnên laşê mîrî**

Xizan Şîlan (Helbest)

Tekilî: birnebûn@hotmail.de

Dengê bavê min-II

Hayrettin Güven



Bavê min, Mihemmedê Seîd xizan bû, sewî bû, ji ber ku bavê xwe zû miribû. Xwendin û nivîsandin nedizanî.

Lê tim digot: "Min nexwend, hûn bixwînin kurê min. Merîyên ku nexwendî kor/kûr in."

Kurrikên xwe gîştik bi xwendin da. Ez bûm bijîşk û lêkolîner li ser kanserê. Xûşk û birayên min jî piranîya wan lîse xilas kir.

"Tizbîya bavê min!"

Salên min belkî 9 belkî 10 bûn. Dikancîyan pir caran tişt bi dên didan û li defterê dinivîsandin heta çinandina zevîyan. Li xermanan me dênê xwe dida.

Rojekê bavê min bang kir û got: "Xoyratîn, çik herê çarşîyê, dikana Miçkî Elî Ûçê tiştî bîstîne, êvarê nîvanên me yî tene.

Ez: "Ez narim. Mewlut (lawê apê Miç) heye xeresê tişt bi dên nade."

Bavê min: "Lo here vê tizbîyî min pêde. Bê vava tizbîya bavkê min e. Got vê Mewlut re bê ma tişt bide,

ez ê paşîngê peran bidim Miçkê li limîya nîvro."

Ez çûm çarşîyê. Dikana apê Miç li ser rêya mektebê bû. Mewlut li ber dikanê bû.

Min got: "Ez dixwazim çend tiştan bi dên bistînim lê Mewlut got: "Na ez nadim."

Hîngê min tizbîya bavê xwe ji berîya xwe derxist û da wî.

Min got: "Bobo go tizbî min bi Mewlut de ma tişt bide ez ê paşîngê paro bi Miçkê dim."

Mewlutê feqir çîng tizbî dît, got: "temam tu çî dixwazî?"

Salên min belkî 9 belkî 10 bûn.

Min dît ku tizbîya bavê min mîna qarteke bankayê bû. Ez kurik bûm û bi heşê xwe yî kurikbûnê min digot bavê min çiqes merîyekî mezin e. Tenê tizbîya wî bes e, ji bo tiştstandinê.

"Sed kitêb û sed kes!"

Salên min belkî 20 belkî 21 bûn. Li Enqereyê, min li zanîngeha Hacettepeyê dixwend. Indin giran gi-

ran min digot qe ez jî çend tiştan dizanime.

Rojekê ez û bavê xwe ketinî nav minaqeşeyekê.

Min got: "Bofko, li vê meselê ne mumkûn e ku tu ji min rindtir bizanî. Min li ser ve sed kitêb xwendine. Tu çing bizanî?"

Bavê min got: "Ee Xoyratîno, ezî îna dikime ku te sed kitêb xwendine. Min nexwendiyê lê ez jî ji sed kesî pirs dikime. Ez jî dizanime."

Salên min belkî 20, belkî 21 bûn.

Min fêhm kir ku zanîn ne tenê bi kitêbxwendinê ye, nezan jî dizanin. Heger tu bixwazî tu ê li cimatan ji xelkê jî bevisî/hîn bibî.

"Çiroka meresê ecer"

Salên min belkî 11 belkî 12 bûn.

Bavê min çend roj bûn ji min re meresek ecer standibû. Piştî çend rojan em tevhev ji çarşîya gund dihatin. Em nîzik mala Hûsê Heyder bi ser rê de berva mal diçûn. Min ci ke dît ku dengê xwe bilind kir û got:

"Va çî tu lingên xwe bi erdê texî, me meresê ecer ji te re sandiye, tu bi erdê re bi xûra dikişînî. Eybe yaw. Du dizanî em bi çî zehmetî peran qezenç dikinî.?"

Min gavên xwe serrast kir, lingên xwe ji erdê birî lê min nedizanî ew çima bo meresekî ez azar dikirim. Min xwe bi xwe got: "Bobo jî çiqes temax e, însan sewê meresekî lawikî xwe azar dike? Heger rojekê ez ji kurikên xwe re eynî tiştî bêm, ez ê hîngê bizanim ku bavê min niha jî heqlî ye/mafdar e, belkî jî herdem heqlî ye. Salan di ser salan re bazda, 30 sal derbas bûn. Ez û lawê xwe ji mekteba wî dihatin. Em nîzikî mal bûn lê lawê min lingên xwe bi

erdê texist wexta ku bi rê de diçû. Ew meresa, min çend rojên berê standibû. Min dengê xwe bilind kir û got: "Lokî min tu çima lingên xwe bi erdê texî. Ne gûne ye me ew meresa ecer sand."

Min çing ew gotina kir ez 30 salî paşva çûm. Gotina min û bavê min û soza ku min dabû xwe hate bîra min. Min got heyhat bavê min heqlî bû û belkî herdem heqlî bû.

Lawê min got "Of bobo, tu sewa meresekî çima vîqes dengê xwe bilind dikî?"

Salên min belkî 41 belkî 42 bûn.

"Duayên bavê min!"

Ez nîzamin çima lê bavê min li min pir dua dikirin. Wîqes pir dua dikir ku ew hemû di bîra min de man. Heta ku rojekê limîya kuşlixê dikir û li ser limîyê dest pê kir dûr û dirêj li min dua dikir. Ez di cîyên li hêlê radike-tim lê min giştik bîstin wek pir caran lê vê carê dayîka/eya min ji oda din bang kir û got:

"Mihemmed tu çima li yekî tenê dua dikî, tenekê li kurikên din jî dua bike, welle Xûdê veng qebûl nake."

Xûdê ji te razî be lokî min

Xîzir bi hevalê te be

Tu qet rojekê ne bi ezî îro çî bibime

Xûdê kurikên bi xêr bi te de

Çî di dilê te da ye Xûdê bi te de

Xûdê te bi rindan va bi heval ke

Te destê xwe avîta çî Xûdê bi te de

Xûdê îşê te rast bîne

Xûdê te ji qeza û belan biparize

Salên min belkî 17 belkî 18 bûn. Min dît ku hemû duayên wî li min qebûl bûn.



Dengbêj Ayfer Duzdaş

Dengbêj Ayfer Duzdaş di sala 1973an de li Sêwasê çêbûye, perwerdeya xwe li ser muzîkê kiriye, bi kurmancî, zazakî û tirkî jî distirê. Di albumên xwe de enstrumanên modern û gelêrî bi kar fîne. Harmonîya melodîyên van enstrumanan, bi kurdî û dengê wê î xas û taybet sitranê şîrîntir, sempatîktir dike. Albuma wê ya vê dawîyê "hey narîm" dilê gelek hezkirên wê xweş kir û gelek kesan jê hez kir. Me jî guhdar kir û me jî ji Ayfer Duzdaşê û vê albuma wê hez kir. Ê me xwest ji bo xwendevanan em gotinên kurmançîya vê klîba wê li vir raxin. (Bîrnebûn)

Hey Narim

Gildir gildir baran e
Îşev şeva yaran e
Yarî lawkê belî ye
Şarî reşî li serî ye

Hey narim rindê narim
Berva te ûstuxwar im
Ezî kuştîm hejandîm
Derdê te ezî xwarim

Keç meke meke meke
Li emro derdan vemeke
Derdê te ezî xwarim
Îşev min teva xwe ke

Hey narim rindê narim
Berva te ûstuxwar im
Ezî kuştîm hejandîm
Derdê te ezî xwarim

Dilê dilê dilê dilê dilê dilê

Vûça vûça çûçikan
Helîn dana quncîkan
Xwedê canê min hilde
Le ser sînê keçikan

Hey narim rindê narim
Berva te ûstûxwar im
Ezî kuştîm hejandîm
Derdê te ezî xwarim



Êkane

Ehmed Berber



Ax...

Hindî xîz û axêt dinyayê Ax!..

Mîna ahêt deykeka kezebbirî

Temet Ahînkêt babekê mêlak lê bûyne pel û gurî

Wekî xemêt buharekê jê may xolî

Xozî min birayek heba

Bila yê bê dest û pê bam

Ew biba dest û pê min

Bê çav bam

Da bîte çav bo min

Ezman û guh min neban

Ew da bîte ezman û guhê min

Çi bikem

Bê birame ez

Eger xudan bira bam

Çi tişt ne dibo xemek bo min

Xema giran hema ew e

Min kes nebît

Ko ez bêjim

Evê heye biryê min

Ew e herdem

Hêz û xemle li rojê min

Çi bikem bê bira me

Bê hewargeh û bê pena me

Xozî nabîte birayê min

Eger min birayek heba

Li tengaviya bê pirs

Da hête dihana min

Li demê kovan û xem û rondika

Da binaze tiblêt xo

Hêdî hêdî vemalît rondikê min

Bi dilovanî bêjîte min

Te çi ye bira

Te kuzirandin hinavê min

Bes e rondik
 Te sot cegera min
 Bêje kula te çi ye
 Li min neveşêre
 Tiyêt çavêt min
 Bes tu yî kurrê deyk û babêt min
 Rondikêt te agir e
 Yê berbûye dilê min
 Xozî... xozî
 Min birayek heba
 Bila li zivistana yê rît û xas bame
 Sed pinî li şelwal û kirasê min hebane
 Li çilê havînê jî
 Her di vê rewşê da bame
 Rojêt têhniyê û bîrsê
 Gotiba keko
 Min ev pariyeyê hey
 Te divêt hemî bo te
 Te divêt nîvekê bide min
 Firreka avê ye
 Sê qurç û nîv bo te
 Nîv qurçê jî eger bideye min
 Rojêt tîrs û lîrzê
 Bibame sîngê wî
 Ew jî biba piştê min
 Xozî
 Min birayek heba
 Roja mirina min
 Biba pena û himbêz bo zarokêt min
 Çi xozî
 Xozîkêt çî!
 Ger deyk û bab mir in
 Çewa êk dê bîte birayê min
 Bê bira me
 Bila ez jî hema bimrim
 Bila nebim
 Bo çi ye hebim
 Bê bira jîna xav e
 Bê rewş û tav e
 Bes jiyan nav e
 Hemî jehr e tijî edave
 Êşa zirave

Ez vê baş dizanim
 Eger bira jî rondika çêbibane
 Hemî av û baranêt dinyayê
 Ne dibone nîva rondikêt çavêt min
 Bê birayê ez kuşt im
 Bar û çiyane
 Li min şikandin
 Hemî gehêt piştê min
 Li jêr dilerzin
 Çok û pêt min
 Bê çare me
 Kî dê girît destê min
 Ax hizar cara ax
 Xozî rojekê êkî li dergehê min daba
 Gîrnîjîba û gotiba
 To yê çeway kurrê deyk û babêt min
 Evro cejn e
 Li me pîroz bît
 Hemî dîtinê te cejn in
 Rojêt li gel te pîrî hezin
 Kanêne birazakêt min
 Biwan cejin dibine cejin
 Bira to yî rava hebûna min
 Xozî... Hîvî... Xewin
 Nabine sîtavka birayekî bo min
 Xozî di pîre sîngê min da mirin
 Hîvî di dilê min da êdî nalivin
 Hemî xewin li gel sipêdê
 Dibine ax
 Dibine axînk
 Ji kwîriyatiya hinavêt min in
 Dinav bê biratîyê da
 Ji xemêt xo da
 Her rojekê
 Her bêhnekê
 Çend cara dimirim
 Hîviya min ya bûye mirin
 Bê bira mîna êke
 Jiyan û mirin
 Jiyan û mirin

Ji çarînên Omer Xeyam

Wergera ji farişî: **Ehmed Mîlan**

Dema sibe ye rabe ey dilbera nazenîn
Hêdî û nerm bade vexwe û çengê lêxin¹
Lewra ewan ku henin nuha, namînin zêde sibe û ew Kesê ku
mirin, nayên dinê du caran

Ey pîrê huşmend sibe zûtirê rabe
Û ew zaroka ku xalyê da digevêze binêre
Şîret bike ku nerm nermik xwe bigevizîne
Axa mijyê serê keyqobad² û çavên pervîz³ e

Teyrek ditim rûniştibû ser banê kela Tûs⁴
Danî bû ber û bin lepê xwe keleyê Keykawûs⁵
Ji ke re dipeyêvî û digot, heyf sed heyf Kanê banga
zengila û nalîna def û naqus

Xeyam, eger ji bade mest î, dilxweş be
Cem lalerûyî heke rûniştî kêfxweş be
Çimkî aqîbeta⁶ karê cihanê tunebûn e Guman ke
tuneyî, wek nuha heyî xweş be

Cama⁷ ku aqil pê ra eferim dibêjin
Sed carî li ber mêhrê⁸, enîya wê paç dîkin⁹
Ev kûziksazê zemanê wekû cama letîf⁹
Camê çêdike û dîsa davêje erdê dixin

Li ber kargeha kûzegerekî diçûm
Li bin piyê çerxê diadîtim ostakî kar dikir
Ji kûzkê ra destê û ser çêdikir
Ji serê padişah û destê parsekçî bû

1. Çeng: cureyek emrazê mûzikê ye.

2. Keyqobad: padişahê med yan madan (kurdan).

3. Pervîz: şahê sasanî.

4. Tûs: bajarekî pir kevn li Xorasana Îranê ye ku di bin êrişên moxol û tirkên de wêran bû.

5. Keykawûs: padişahê madan e, pir bi hêz bûye.

6. Aqîbet: dawî, axirî, nefîce, serencama berhemman.

7. Cam: qedeh, piyale, tas.

8. Mêhr: mêhrebani, merhebet, hezkirin, dostî, evîn / tav.

9. Letîf: nerm, nazik, mêhreban, xweşexlaq û xû.




Mizgînîya me li we zarokno!

**Ji weşanxaneya APECê berhemeka nu bi nivîsîna Seywan Saedian
û bi wêneyên Runak Resulpur**

Juĵî çîrokeke ji bo zarokên 5 û 10 sale ye. Bi kurdî û swêdî hatiye weşandin. Çîrok li ser Daykemişkeke xembar û bêçare ye ku her cara çêlik jê re çêdibin, mar û kundek tê û wan dibe. Daykemişk bi vê êş û xemê ye heta ku rojekê Gwênî pêşniyazekê li wê dike.

Pêşniyaz jî ew e ku Daykemişk ji dirikên wê ji xwe û ji çêlikên xwe re qazaxan çêbike. Daykemişk wusa dike: ji dirikên Gwênîyê ji xwe û çêlikên xwe re qazaxan çêdike û êdî ne mar û ne jî kund dikane hêrişî wan bikin. Daykemişk û çêlikên xwe bi hev re li mala xwe ya binê dirikê bi bextiyarî dijin.



SEYWAN SAEDIAN

Ji rojhilatê Kurdistanê ye. Piştî penaberîya li çar welatan, anuha li Swêdê dijî. Seywan Saedian hunermendekî piralî ye: hunermendê şewekarîyê, peykertraşê dar û kevnehesinan, şaîr û nivîskarê pirtûkên zarokan e. Pirtûka Juĵî yek ji van pirtûkan e. Lê bêtir peykersazîya wî bala meriv dikêşe ku çawa ji kevnehesinan peykerên balkêş û bedew saz dike. Peykerên wî li gelek bajarên cuda cuda hene: Şengal, Hewlêr, Bonn çendek ji van bajaran in.



RUNAK RESULPUR

Ji rojhilatê Kurdistanê ye û ew jî piştî penaberîya li çar welatan anuha li Swêdê dijî. Li Îranê di unîverstîyê de hunera keramîkî, desenên grafîkî xwendîye û ev nêzî 20 salan e ku li ser vê hunera xwe kar dike. Ji bilî vêya îro bêtir giranîya xwe daye ser wênesazîya animasyon û pirtûkên zarokan.

DONATIONER

— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —

ALÎKARÎ

— TEVLÎ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —



Donera till
Stiftelsen Kurdên Anatoliya Navîn


0,00
SEK

☐ Gör det här till en månatlig donation ?

[Donera med PayPal](#)

[Donera med ett betalkort](#)


Betala enklare.



123 356 67 91
Swish-nummer





TEKILÎ / KONTAKTA OSS
Mjölmarstigen 1, 163 41 Spånga,
Stockholm, Sweden
Telefon: 0708 32 39 58
E-mail: info@stiftelsenkan.com

Hevkarên me / Våra samarbetsparner



Södra Stockholms
Folkhögskola



ABF Botkyrka-Salem